

## Kurdzan Dr. Rûdenko û Evdalê Zeynikê



**D**r. Rûdenko di navbera salên 1950-55'an de bi dewlemendiya çand û wêjeya Kurdan dihese, digere û bi çavên xwe dibîne. Dema vejerê wiha dibêje: "Li Rojhilata Navîn ci gencîneyek sergirtî hebe, ew çand û wêjeya Kurdi ye."

Rûpel 10

## Hebûna Partiya Demokrasiyê ya di meclîsê de tê munaqêsekirin DEP di pêvajoyeke girîng de

**R**êvebirêñ Navenda Partiya Demokrasiyê û serokêñ DEP'ê yên bajaran, roja yekşemê ji bo biryareke girîng li Enquerê dicivin. Dê di vê civînê de li ser pest û pêkutiyêñ li ser DEP'ê bê rawestin, şertên nû bêne nirxandin û bernameyên têkoşîneke berfirehtir bê guftûgokirin. Di vê de ji bo awayên têkoşînê du dîtin derdikevin pêş. Yek ji van, vekişîna mebûsên DEP'ê ji parlementoya KT'ê ye. Ev dîtin bi pirranî ji aliyê hêz û kesên ku ne di nav DEP'ê de ne tê pêşkêsekirin û di nav pirraniya endamên DEP'ê de alîgir nabîne. Di nav DEP'ê de bi pirranî mayîna di meclîsê de tê pejirandin.


**B**i kuştina Mehmet Sîncar û girtina Yaşar Kaya re, Partiya Demokrasiyê mecbûr ma ku, polîfikayêñ xwe ji nû ve binirxîne. Ji bo rîlibergirtina êrîşen dewletê yên li hember DEP'ê û hêzên demokrasiyê û ji bo tesbitkirina polîfikayêñ nû di hemû qadan de guftûgoyêñ girîng pêk têñ. Dîtinêñ cihêreng, ji aliyê hêzên cur be cur ve têne pêşkêsekirin. Tev pirsa "divê DEP ci bike" munaqêse dikin. Hêzên ku ne di nav partiyê de ne, dibêjin bi-la mebûs bi lez ji meclîsê vekişin. Rêvebir, mebûs û endamên DEP'ê bi pirranî li hember vekişîna ji meclîsê dertêñ.

Rûpel: 8-9



Bi kuştina Mehmet Sîncar re êrîşen li hember DEP'ê tundtir bûn. DEP jî niha li dû polîfikayêñ nû ye.

## Gelê Başûr NÇM hembêz kir



**T**ürneya Navenda Çandê ya Mezopotamîyê (NÇM) di 16'ê İlonê de li Zaxoyê bi kîf û şahîyeke mezin ve qedîya. Tûr-ne di 28'ê Tebaxê de dîsa li Zaxoyê dest pê kiribû. Di çalakiyêñ NÇM'ê de gelê Başûr pêwendî û kîfeke mezin şanî endamên NÇM'ê danî.

Rûpel: 11

### Bi afirînerê tîpa "Karga" re hevpeyvîn

## Qijika hawarê li Gündem'ê danî



✓ Divê hunermend li pêşberî civakê be lê hêza xwe ji civakê bistîne. Yanî cihê ku gihiştê divê civakê ji bikişîne wir. Gava ji civakê veqete, li gor min tu mîsyona wî nemaye. Edî bûye mexlûqatek.

✓ Iro li Tirkîyê faktora mîzahê li hember muxalefa-ta civakî tê bi kar anîn. Tê dejenererekirin. Rûpel: 16

# Rojnamegeriyê dixwînim

Hevalên hêja, xebatkarêñ rojnameya Welat hêvidar im ku, hûn bi xweşî û şadî bijîn û her wext niştîmanperweren we û me li nav miletê me de hebin û Yezdanê jor hêzê û saxiyê bide we. Hevalên hêja, ev helbesta ku min nivîsiye, li ser xwişka hêja û nimûneya keçen Kurd (Leyla Zana) hêvidar im, hûn di Rojnameya Welat de biweşînin.

Ez rojnamevaniyê dixwînim li Rûsyayê. Ger ez bikaribim bi we re kar bikim, ji bo min binivîsin ci ji min tê

xwestin û bi taybetî ji Rûs- yayê û zor spas

## LEYLA ZANA

Li welatê min gulek şin bû Şax veda bi rengên delal Natirse ji şûrê dijmin Şev û roj dike xebat Ew gul şin bû iro Nayê birrîn bi hêsanî reh berda binê derya Edî dijmin kete tirsan Leyla Zana keçika Kurd Peyvîn bi navê milet Miletê Zerdeşte kal Maye bêcîh û bêwar

Metirse keça şeran Keça Firad û Dîcle Keça Hekar û Bagok Keça Hindirin û Qendil Tu bibe nimûneke mezin Ji bo her keçika Kurd û jar Edî bes e koletî Bila şiyar be bes e Li te fihîl be ey Leyla Şîrê berê dayika te Neh mehîn ku tu hilgirtî Rebeniya bavê te Te ceger li min kir piling Herim dijmin sîng bi sîng An bijîm wek mirovan An bimirim nebim kole

**Perwer Shamoo/ Rûsyâ**

# Yezdanê adilê adilan

Bi navê Yezdanê Adilê adilan. Dirokzanê eziz, mamoste, lêkolinvan, gernasê welatperwer heval Nihat! Min ew xebatêñ we yên Welat xwendin. Kêfxweş im. Dilê min ges e. Hêvidarî serkeftinê me. Serkeftina civakî ya şoresser û têkoşerê jiyana berxwedan û serhildanêñ li hember zilm û zorê, talankerî, kedxwarî û dagirkerye!..

Mala te ava be. Tu her bijî û her hebî bi xêr û xweşî. Ez mele me... Welatparêz im. Serfinaz im. Jiyana min bi berxwedanî û serfinazî bihuriye. Tenê bi nizanîbûna dîrokê ya warê xwe xemgîn im. Tarî me. Muhtacî ronahiya dîroka bi rastî me. Çavêñ min li rêka kar û xebatêñ lêkolinvanî û lepirsîn dîrokzanan e. Vê bizanibin. Ji bîr mekin. Tim û tim bi bîr bînin. Bawer û me, dîrok ji bo me zar û zêçen asîmile û perîşan roja tarîfîyê diferikîne.

Belê ronahiyêñ hûn didin me, em didin gel. Gel welatparêz e, lê belê ronakbîr e ji. Dema ronahiyêñ we bicirisin dibînin. Dema bitefin dibînin.

Ji vê gotinê daxwaziyêñ min hene. Daxwaziya min a herî mezin ev e, hinek nivîskarêñ rojnameyê heqaretê dikin. Neheqî dikin. Dilêñ me dişkînin. Asteng didin ber ronahiya jiyanê. Di xebatêñ xwe yên nivîskarî de ne objektif in. Xusûsêñ der heqê mafê ola îslâmê de diltenik in, yanê ne zanist in.

Ji xwe gel bi ol hatiye xapandin. Ev bûyer e. Bi meletiya xwe qebûl im. Lî iro, roj roja wekhevîtiya ol û armancêñ ideolojîyê ye. Roj roja vekirina dijan bi dilan re ye. Helandin û kelandina bi hev re weke av û ba lazim e. Têlén bi strî yê hesin raxistine di nav dilan de. Iro zar û zêç, keç û xort, jin û mîr tev bi hev re bi xwîna xwe ev hidûd xera kirine. Lî hezar mixabin, hezar heyf ku, ev mirovîn me yên rûspîtiya gelê me û gelên din bîn biçûkkirin, dê li wan neheqî û heqaret bibe.

Ayhan

# Marşa welêt

Mêj ve bêje; kî siwarê Rojhilatê Navîn e...!?  
Bêje; kî Kurmanc û lor in,  
Bextîr û Sorî ne...?

Kî ne yên ji pêsiya hebûnê de  
hebûn û hîn hene...?  
Kî ne yên li rûyê demê  
sert mane û neşikestine...?

Rab ji xew ey Rojhilatê; kî bûn  
en nav dane te...?  
Kî bûn ên ku tox û alên wan bi tev de  
sor bûne...?

Kurdên Kurdistan em in şervanê  
roatê teng û zor  
Niştimanparêzger in em,  
her xwediyêñ vê qadî ne...

Xwediyêñ rûmeta pak in me  
parastiye bi cêñ  
Dêwêñ rojêñ şer û cengan, tev de  
ar û pêti ne

Rakerêñ doza mirovatiyê li cihanê em in  
Torînê Zerdeş û Kawa,  
Key û Xusro û Mîdî ne

Lew bizane mêj ve; "Kurd" em namirin  
ta tu heyî  
Ji ber jiyan dest pê dike,  
bi Kurdan û bê wan namîne

**Ji dîwana Destana Şehîdan/ Dilsoz**

## XALÊ MUSA

Dijmin ji nivîstoka te pirr ditirsiya, lê niha devê çekêñ gerila tev dîroka serxwebûn û azadiya welat dinivîsinin.  
Hejmar bi ser deh hezaran ket.  
Mîzgîniya min li te û xwarziyê te  
Hüseyin ku xaka Kurdistanê bi ber  
rizgarkirinê ve diçê. Hûn di têkoşîna  
rizgariya netewî de dijîn û herdem bijîn.  
Jiyana tewra bi rûmet jî ev e. Bi jînbûna  
we ya di bilindikirina têkoşînê de dijmin  
diteqe, qehir dibe, bala  
dilê we şad be.

**Xwarziyê te H. Deniz**

# Nîvîsara Welat

## Dozgerê Tirk û Kurdi

Dî van hefteyêñ dawî de Komara Tirkîyeyê şerê xwe yê qirêjî yê "topyekûn" ji berê jî dorfirehtir û dijwartir dike. Her çiqas dengê raya giştî kêm dibe, dijwariya dewletê jî berevajiyê wê zêde dibe.

Ku gel li hember kuştina mebûsê DEP'ê Mehmet Sîncar bi awayekî girseyî nemeşıya, barîkatên hêzên dewletê neşikandin û cenaze ji dewletê nestandin, dewletê bi hemû hêza xwe ve giranî da êrîşen ser warêñ legal. Ji bo girtina Gündem'ê û kovarêñ din ên pêşverû mehkeme li ser mehkemeyê der heqê wan de vedike, rojnamevanan û mirovîn demokrat diavêje zîndanan.

Girtina Serokê Giştî yê DEP'ê û her wiha xwediyê Gündem'ê Yaşar Kaya jî, hinek ji ber bêdengiya girseyî bû. Bi dîtina me rayedar, mebûs, bi taybetî ji Serokê DEP'ê Yaşar Kaya li ber rîlibergirtinê merasima cenazeyê Mehmet Sîncar hinekî din bi rîexistinî bilîviyana û dengê xwe bilindir bikirana, wê dewletê jî mecbûrî bi paş ve gav biavêta.

Lê wisa xuyaye ku, dewletê jî vê bêdengiyê cesaret stand û êrîşen xwe li ser warêñ legal tundtir kirin û dike. Helbet li hember neheqî û êrîşen hovane, pêwist e hemû kes dengê xwe bilind bike, bes disa jî berpirsiyariya mezin dikeve ser milê partî û rîexistinî girseyî yê demokratik. Hîna ku nebûye dereng, lazim e di serî de DEP, hemû rîexistinêñ legal ên pêşverû ji bo ji holêrakirina vê bêdengiyê serê xwe bişînin û li çareyêñ bi tesîr bigerin.

Hefteya çûyî Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê (DED-S) der heqê du nivîsêñ Welat de banga sûcdariyê ji me re şand û em dawetî mehkemeyê kirin, da ku ifadeya xwe bidin. Ev cara yeke-mîn e ku, der heqê nivîsêñ me de dewlet bangeke sûcdariyê dike. DED'a Stenbolê sernivîsêñ du nûçeyen "Gelê Tirk jî bi ser xwe ve tê", "Li Edenê polisan teror pêk anî" ku di hejmara Welat a 73'an de hatibûn weşandin li gorî xwe wergerandine Tirkî û di wan de sûc dîtine. Nivîsa Manşetê "Gelê Tirk jî bi ser xwe ve tê" wek "Türk halkı da baş kaldırdı (Gelê Tirk jî serî rakir)" wergerandine Tirkî. Diyar e ku, Dozgerên Stenbolê hê jî hînî Kurdi nebûne. Di hevokê de peyva "ser" dîtiye û li gor texmîna xwe gotiye, hebe nebe ev hevok tê wateya "Gelê Tirk serî hilda".

Ku hîna dozgerên dewletê nikaribin sernivîsekê wergerînîn Tirkî, gelo wê çawa nivîsê giş wergerînî? Lê ku wergerînîn jî çawa dikarin rastiya wê ispat bikin? Ji ber ku tercûmanêñ dewletê yên zimanê Kurdi nîn in. Ku hebin jî, ji kî ehliyet standin? Ji xwe di Qanûnê Bingehîn a dewletê de zimanê Kurdi wek ziman nehatiye qebûlkirin. Vê carê, bi rastî em jî nizanîn wê dozger çawa li vê dozê binêre.

Emê çend rojekê din ji bo ifadeyê herin rû dozger. Ka emê bibînin wê çawa dozger ji nav vê doza tevlîhev derkeve. Bi rastî em jî pirr meraq dikin.

## Ferhengok

**Bêwire:** Bêezm

**Cekêñ tuneker:**

Sîlehen îmheker

**Cekêñ navikî:**

Sîlehen nukleerî

**Cêl:** Têjik, çêlîk

**Muşek:** Fuze

**Nihêni:** Nepenî,

veşarî, sirr (gîzem)

**Pasevan:** Pavan,

nobedar

**Pêşande:** Hefle (gösterî)

**Sande:** Nîerde, qasid, mîsyoner

**Sayan:** Teqdîr

**Tor û dey:** Her dem

**Wire:** Ezm

**Xilafe:** Xerîfi, zenhimî (bunak)

# Nûçeyên Cengê

## Navenda Nûçeyan-

**16'ê İlonê 1993:** Li çiyayê Agirî û Tendürekê operasyonê dewletê hefteyeke didomin. Li Agiriyê gundê Çobaneqeska û Zozanê Kulîkzerê di navbera hêzên dewletê û gerîlayen ARGK'ê de şer derket. Li gorî agahîyen herêmî 33 leşker, 6 tîmân taybetî û 2 gerîla hatin kuştin. Laşen leşkeran bi helikopteran ve hate kişandin. KURD-HA'yê beyan kir ku, li der û dorê Agirî û Tendürekê çekên kimyewî hatine xebitandin.

Gerîlayen ARGK'ê saet di 14.00 de êrîş bire ser gundekî navçeya Çermûgê, Kulanxanê 13 cerdevan revandin, eynî roj li navçeya Çingûşê gundê "Birkuyularê" gerîla êrîşek bire ser û 19 cerdevan revandin. Li ser sozdayina wan a bi gerîla re, hatin berdan.

Li navçeya Agiriyê Bazidê, hêzên dewletê şerîn du kesan kire sedem û bi panzeran ve li gelê navçeyê gule reşand. Huseyîn Tokal berê hate birîndarkirin û dû re bi panzerê hate perçiqandin, di vê bûyerê de 9 kes jî hatin birîndarkirin.

**17'ê İlonê:** Di navbera hêzên dewletê û gerîlayen ARGK'ê de li navçeya Diyarbekirê Pasûrê (Qulpê) li hêla Çemê Şekiran şer derket, hêzên dewletê navçe dan ber gulebaranê.

Li Dêrsimê navçeya Pûlûrê (Ovacık) gerîlayen ARGK'ê êrîş birin ser Qereqola Ze-rangê (Yeşilyaz), 6 leşker hatin kuştin, 2 leşker hatin birîndarkirin. Li Pilemûrî, gundê "Yolaçtiyê" jî di navbera gerîla û leşkeran de şer derket, mamostayek hate kuştin.

Li Geverê (Yuksekovayê), li Yeniköprü û li nêzîkahiya Tünel Çeşmesiyê de gerîlayen ARGK'ê rê bîrrîn û efserek (astsubayek) kuştin, çar makîne şewitandin.

**18' ê İlonê:** Li Diyarbekirê Pasûrê (Qulpê) li gundê Tiyaksê di navbera hêzên dewletê û gerîlayen ARGK'ê de şer derket gerîlayek û çar leşker hatin kuştin. Li Qulpê 9 kes hatin birîndarkirin.

Li Mûşê li gundê Mongokê di navbera hêzên dewletê û gerîlayen ARGK'ê de şer derket 7 leşker hatin kuştin û panzerek hate rûxandin.

Gerîlayen ARGK'ê êrîş bire ser navçeya Agiriyê Xamûrê, bi hêzên dewletê re şer derket. Di navçeyê de 10 kes hatin binçavkirin.

Li Diyarbekir, li navçeya Gelê gerîlayen ARGK'ê êrîş birin ser lokala mamosteyan, nasname kontrol kîrin û 5 kes kuştin.

Gerîlayen ARGK'ê êrîş birin ser navçeya Agiriyê Xamûrê û bi hêzên dewletê re şer derket, kuştin çenebûn, di navçeyê de 10 kes ketin bin cav

Li Ruhayê navçeya Pîrûsê (Surûcê) gundê Dînlenceyê de du kes ji aliyê gerîlayen ARGK'ê ve hatin kuştin, ev kes di mehkeme ya gel de bi muxbiriyê ve hatibûn súcdarkirin. Li Batmanê du panok(bekçî) hatin kuştin, li navçeya Dêrsimê Mêzgîrê (Mazigirtê) pişti kuştina 3 gerîlayen ARGK'ê esnaf ke-pengêñ xwe girtin.

Li Agiriyê navçeya Bazidê li gundê "Örtülüyê" hêzên dewletê şivanek kuştin, li gundiyan îşkence kîrin.

Li Agirî û Tendürekê operasyon didomin, nêzîki 20 gundî hatine hîşandin

**19'ê Hilonê:** Gerîlayen ARGK'ê êrîş bi-re ser navçeya Agiriyê "Taşlıçayê", di navbera hêzên dewletê û gerîla de şer derket. Di

şer de 18 leşker û 4 tîmân taybatî hatin kuştin. Gelê navçeyê ji ber gulereşandina tîman kepengêñ xwe girtin.

Li Diyarbekirê Cadeya Înönü de gerîlayen ARGK'ê êrîş birin ser pastexaneyekê, 2 leşker kuştin û 4 şagirtên dibistana polîsiyê birîndar kîrin.

Li Cûlemêrgê navçeya Çelê (Çukurcayê) jî mînîbusa Ali Çiftçi li mayinê ket, bi navê Ömer û Salih Dayan 2 cerdevan hatin kuştin, 7 kes jî birîndar bûn.

**20'ê İlonê:** Li navçeya İdirê Aralikê saet di 24.00'an de gerîlayen ARGK'ê (Halk Eğitim Merkezi) Navenda Perwerdehiya Gel dame ber agir, di bûyerê de kuştin neqewimî. Li Çepekkûrê (Bingölê) gerîlayen ARGK'ê mutehîtek kuştin, li gorî Ajansa Anadoliyê gerîlayek jî hatiye kuştin.

Li Agiriyê navçeya Elaşgirê gerîlayen ARGK'ê êrîş birin ser stasyona Radyolîngê ya TRT'ê, stasyon gişt rûxandin. Di navbera leşker û gerîla de şer derket, lê tu kuştin çenebû.

**21'ê İlonê:** Operasyonê dewletê li Agirî û Tendürekê derbasî Cûdiyê dibin. Li Cûdiyê hinda Berava, Çiyayê Zerge di navbera gerîlayen ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket, 13 leşker hatin kuştin, efserek û 10 leşker ji aliyê gerîla ve hatine dîlgirtin. Di şer de gerîlayek hate kuştin, gerîlayek jî hate birîndarkirin.

Li Meraşê komek leşker ên li navçeya Andırinê ku diçûn nehiya "Gebenê" di navbera wan û gerîla de şer derket, bi navê Muhamrem Özkan, Hüseyin Karagöz 2 leşker hatin kuştin. Li Ruhayê gerîla rî bîrrî, mixtarê gundê "Sıralarê" Müslüm Şahin kuştin û mînîbusa wî şewitandin. Di vê bûyerê de cerdevan û mixtarekî kevin jî hatin kuştin.

Li Dêrsimê navçeya Pûlûrê (Ovacık) gundê "Topuzlarê" gerîlayen ARGK'ê dibistana gund şewitandin.

**22'ê İlonê:** Li Bilişê li navçeya Xîzanê li Zozanê Govaltinê di navbera hêzên dewletê û gerîlayen ARGK'ê de şer derket 12 leşker û 10 cerdevan hatin kuştin.

Gundêni li ser nahiya Dereyê ne, çend roj in makîneyê wan li ber derê Qereqola Per-taxa Dêrsimê hatiye sekinandin, ên ku diçûn hêzên dewletê li ser wan kotekiyan dikin.

Li İdirê gerîlayen ARGK'ê êrîş birin ser şantiyeye rî û depoyê şantiyeye şewitandin, di êrîşê de kuştin çenebû lê xesar zêde ye. Dîsa li İdirê gerîla 2 avahiyêne mektebê şewitandin.

Li Batmanê şervanê ERNK'ê tesîsîn TPAO'ye bombe kîrin, di avahiyâne de xesar çebûn. Li Agirî 6 cerdevanê ji navçeya Patnosê çek danîn. Li gorî ajansa AA'yê gerîla li gundekî Bismilê êrîş birin ser santrala PTT'ê. Pişti êrîşê operasyon pêk têne û 4 gerîla hatin girtin.

Li navçeyen Meraşê "Andirin" û "Ekînözü" yê şerî gerîla û hêzên dewletê de 3 roj domand. Li gorî agahiyâne 2 leşker hatine kuştin.

Li Erzînganê, li gundê "Çaxlarê" gerîlayek bi destê îxbarkarekî hate kuştin. Li Miksa (Bahçesaray) Wanê 6 cerdevan çek danîn. Li Agirî û Tendürekê, pişti şerî gerîla û hêzên dewletê, li gundêna hawîrdor operasyon destê kîrin. Li gorî agahiyâne ji 7 gundan nêzîki 70 kesî hatine binçavkirin.

# HAWAR

## Dilbixwîn

### Agirî di nava dûmanê de bû

**B**erî vî bi du rojan, tûristên ku çûbûne Kurdis-tanê û ji aliyê gerîlayen ARGK'ê ve hatibûne girtin, ji wan hemwelatiyê Swîsreyê gîhîstine welatê xwe.

Weke tê zanîn pişti ku, gerîla tûristan serbest ber-dabûn, ji hêla dewletê ve hatibûne girtin. Berpirsiyare Ewlekariyê yê herêmî wiha dibêje wan: "Ne ji bo tûrîzm û pêkanîna lêkolînan, hûn hatine li vir PKK'ê bîbînin û biçin li vegerê propaganda û bangêşıya Apo li Ewrûpayê û li welatê xwe bikin. Hûn ne tûrist in, hûn terorist in. Lewre ji divê em li hev bipirsin".

Dema ku, tûristên Swîsri gîhîstîn welatê xwe, zarokên Kurdan gul û nêrgizên rengîn hilgirtin, pêrgînî wan çûn û bixêrhatina wan kîrin. Di dilê zarokên me de ev mesaj hebû: "Bi navê zarokên Kurdan, ew zarokên di nava agir de dişewitin û bi hesreta azadiyê dinâlin, hûn bi xêr hatin."

Wê demê ji wan tûristan, tûristek gava zarokan di-bîne, çavên wî tijî hêstir dibin, digiri, carekê li wan, carekê ji li gulên di destên wan de dinêre û serê xwe berdide jêr. Di

wê kîliyê de tûrîst dixwest vê bibêje: "Guneh û súcê van zarokan ci ye? Mirov çawa dikare wan bikuje û gulên di destên wan de biçilmisine?"

Giriyê tûristê Swîsri bala hemû rojnamevanan û kameramanan kişande ser xwe. Jurnalîstekî kâ-naleke TV'ye xwe negirt mîq-rofona xwe ber bi wî ve anî û jê pîrsî:

-Tu çîma digi-rî?

Tûrist dizane çîma digirî. Elbet ne dema giriyê ye. Lî dîsa ji neçar dimîne, tiştek ji dest naqede, tenê di-kare bigirî. Kesereke kûr kişand û bersivand:

-Ez negirîm wê kî bigirî! Dema ku ez ji Kurdistanê derketim, Agirî di nava dûmanê de bû. Dewleta Türk Agirî bombe dikir, dişewitand. Dewlet hemû tişti dide ber xwe. Ji zarokan heyâ bi dar û beran. Zagona kuştin û qirkirinê li wir bi rî ve dibe.

Haya kesî ji Kurdistanê tune ye. Li wir mirovahî pirr bi rûmet e, lê dewleta Türk li Kurdan qedexe kiriye. Kurd di ci rewşê de ne, çawa jiyana xwe didomin, kesek nizane. Belkî jî naxwazin bizanibin".

Rojnamevan dipirse:

-Te li wir ci dît?

-Li vir zarokên Kurdan ji min re gulên rengîn pêşkêş dikin, li wir zarokên Kurdan di ablûqeya mi-rinê de ne. Di vê cîhanê de neheqîyeke mezin li Kurdan dibe.

Bi rastî, bila ez bi mehan di nava gerîla de bûma û rojeke tenê ne li cem dewletê bûma.

-Te Kurd çawa dîtin?

-Kurd însan in. Mîvanperwer in. Min hem sivilan, hem ji leşkeren wan dîtin, gelek ji welatê xwe hez di-kin. Azadiya xwe dixwazin, mafekî rewa ye. Gerîlayen wan jî, ji bo serxwebûna welatê xwe can didin, birçî dimînin, zorê dibînin, birîndar dibin... Di nava berfê de bi rojan dimeşin, ez mecbûr dibim bi rîzdarî li hember qehremaniya wan bisekinim.

Erê, welatê me di nava dûmana bombeyan de ye. Gelo bi qasî tûristê Swîsri em Kurd li ser digirin?

Bi Arafat re hevpeyvîn

# “Ev ber bi dewleteke Filistînî ve gaveke girîng e”

**Nûçeyen Derve**-Rojnamevanê kovara **TIME’ê Dean Fischer** bi Serokê RRF’ê Yaser Arafat re peyiî. Em vê hevpeyvînê werdigerînin û pêşkeshî xwendevanê xwe dikan.

-We niha peymana aşıtyê imze kir. Dê ji vê û pê ve ci bibe?

Li pêşberî me tengasi gelek bûn. Me ji sifirê dest bi kar kir. Hebûnên bingehîn ên Gazzeyê hatin rûxandin. Me alîkarî divê, ne tenê ji dost û birayêñ xwe, lê ji kesen ku bi rastî li vê herêmê aştî dixwazin ji. Aştî pêdiviya gelê Filistînî ye, lê li nik vê ji bo Ereban, İsrailîyan û Amerîka û Rusya ji pêwist e. Hemû hêzên li ser cihanê berjewendiyê wan li vê herêmê hene. Ji ber ku ev herêm ji alîyê petrolê ve dewlemed e.

Ez ji bo pêşerojê bi hêvî me. Serokê Amerîkayê Clinton bi helwestek xweşik li dora min geriya. Hevalên li Washington jî bi dostanî têkili bi min re danîn. Wek tê zanîn, hevkariya bi Serokê Amerîkayê re ji bo meşandina vê lihevkiyînê pîrî girîng e.

-Gelo hûn helwesta gelê Filistînî liember vê peymânê çawa dinirxînî?

Li her derê pirozbahî hene. Her çigas hinek rexne hebin ji cara yekemîn e ku, gelê me bi pirraniyek berbiçav bawer dike ku dê li ser erden Gazze-Erîhayê otorîteyeke Filistînî ava bibe. Heta niha gelek mirovan êş û jan kişandin, lê ev tiştekî normal e.

-Dê bi rêxistinênu ku peymânê napejiyîn re (yên wek Hammâs) serêşî çê bibin?

Na, ez ne di wê fîkrê de me. Pirraniyâ gelê Filistîn li hundir û li derveyî wela piştgiriya me dike.

-Hûn li ser têkiliyê bi van rêxistinan



Yaser Arafat

re ci xebatê dikin?


Em riya dialogê vedikin. Hammâs’ê ji bersiva banga min ji bo civîneke li Yemenê da. Ez dixwazim bêjim ku, Şex Ehmed Yasîn damezrenê Hammâsê dê di demeke kin de bê berdan. Gelê Filistînî ku evqas cangorî dan, divê zirarê nede vê serkeftinê.

-Ev lihevkiyîn we ji bo gihîstina encameke erêni dê cesaretê bide dewletên Ereb en ku bi İsrail re rûniştine?

Urdinê, piştî me bi İsrailê re peyman imze kir. Ez bawer dikim Sûriye û Libnan ji dê bigîhîn encameke bi vî rengî.

-Hûn dibêjin dê ev tiş di demeke kin de pêk were?

Belê, ez wisa difikirim. Lê ev peyman ji bo me ji di riya serxwebûnê de tenê gavek e. Em dê piştî serxwebûnê bi vîna gelê xwe ya serbest bi Urdinê re konfederasyonekê ava bikin. Me xwe li vê



Izak Rabin

yekê girtiye.

-Dewletên Kendavê ji bo ku we di dema şer de li nik Sedam cih girt, ji we re bi hêrs in. Hûn niha nîşanên baş dibîn an na?

Ez bawer dikim ku, em dê bi wan re rûpeleke nû vebikin. Pêdiviya me bi vê yekê heye. Min hemû hûrdayetiyê (teferuat) vê peymanê ji Qral Fahd re şand. Sultan Qabûs û Umman’ê ev agahî dan min, Qral Fahd ji bo piştgiriya me li dû peymaneke bi hemû dewletên Kendavê re ye.

-Hûn piştî ev çend salêñ malkambax, ji bo berpirsiyarek nû amade ne?

Xem nexwe, Filistîniyan ji bo birêxistina Ereban gelek salan kar kiriye.

-Hinek kes dibêjin ku, ji bo pêşengê Rêxistina Rizgariya Filistînê (RRF) ên li Tûnûse ne hêsan e ku, bi kesen li herêmê re koordînasyonekê ava bikin.

Hûn çawa difikirin?

Haya wan kesan ji têkiliyê me nîn in. RRF nasnameya gelê Filistînê ye. Endamên wê li hundir û li derveyî welat hene. Min peyman imze kir û desthelatdarî da heyeta Filistînî û şand Madridê, lê haya kesi jê nebû. Niha em ên ku ji rêxistinê cihêreg in hemû endamên komîteya rêvebirina rêxistinê ne. Divê ji bo pêdiviyen nû û cihêreg amadekariyîn me hebin. Em saziyên nû ava bikin û yên heyi jî xurt bikin.

-Filistîn û İsrail dijminen hev ên salan bûn. Jiyana we di nav şer de derbas bû. Niha ci hat guherin?

Bi salan in ku, ez banga şerrawestinê dikim. Aştî mirovîn wêrek divê. Niha ev kesen wêrek Arafat û Rabîn in. Derxistina şer gelek hêsan e. Lê rawestandina wê û bidestxistina aşıtyê zor e. Niha li ser rûyê dînyayê hikmîn “Nîzama Nû” dimeşe, em ji dixwazin wek gelên Filistîn û miletên Ereb bibin hevparê vê nîzamî.

-Hikariya vê hevdîtina veşarî ku li Osloyê çêbû heta kijan radeyê riya li hevhatinê vekir?

Dema Rabîn û Peres ev tiş pejirandin, riya lihevkiyîn bi nîvî vebû.

-Bi rastî ji we bawer dikir ku, dê we yê vê rojê bidîta?

Ez bawermendekî xurt im. Dema balefîra min qeza derbas kir du tiş hatin ber çavê min. Tişte yekemîn dîmena bîrayen min ên hatine kuştin, wek Ebu Cihad, Ebu Liyad û ew ên din. Tişte din ku min dît mizgefta El Aksa bû. Min got: “Li benda min be ez dê bêm di na va te de nimêj bikim.” Wateya vî tişti ev bû. Ezê bijîma û li wê mizgeftê dua bikiroma.

## Wiletaniy Ereb piştîwanî le rêkkewtiniy Gezze-Erîha deken

Encûmeniy Koriy Wilataniy Ereb le Kobûnewey rojîy 20’iy em mange da le Qahîre piştîwaniy xoy bo rêkkewtiniy Felestîn-İsrâyîl derbîriy u em rêkkewtiniy wiha jimard ke hengawêkiy pêşîneye bo cêbecê kirdinîy bineratiy “Xak le beramberiy Aştî da”, herwiha KWE xwazîriy ewes bû kehengawîy gurc u dirêj le hemû biwarêk da bîhawêjîrê be corê ke kişanewey İsrâyîl le Colan’iy Sûriya u sercem xakiy dagirkirawiy Libnan u Ûrdin desteben bikat.

Serokiy Felestîn Yasîr Erefat ke besdarî em kobûneweya bibû gotiy: “Rêkkewtiniy Gezze-Erîha hengawîy yekeme be régay kîşanewey hêziy dâgîrker li tewawîy xakiy bindeste u Qu-dis’iy pîroz da u geranewey penahendekanî Felestîn le saliy 1948 ewe”.

Emru Mûsa’iy Wezîriy Derewey Misir le barey rêkkewtiniy Gezze-Erîha we raygeyarel ke em rêkkewtine hawşanîy bîryar-geliy Lutke Erebiye cor be corekane, herwiha witîy ke bîryariy sercem em lutkane debejîn têkay Ereb la-yeniy bîryariy serbexoy Felestîn u Rêkkewtiniy Rizgarîxwazî Felestîn degîrin.

Sayaniy gutine ke têkay wilataniy

Ereb ew beyaneyan pesind kird ke le layen Yasîr Erefat ewe xwêrdrayewe tenya Êraq nebê.

Le heman kat da Wezîrey Derewey Emrika dawetnamey bo ejmarêkiy zor le Wezîriy Abûrî u Derewey dinya narduwê u daway lê kirdün bo ewey rûbikene Waşîngton u lewê le mangiy Oktoberiy dahatû da kobîbnewe le penâw piştîwanî kirdinîy abûrî le rêkkewtiniy Gezze-Erîha.

Biryar waye ke serokiy Emrika Bil Clinton u Warin Krîstofer’iy wezîriy dorewe 48 serokiy wilatan bibînîn u han-yan biden bo piştîwanî le rêkkewtiniy Gezze-Erîha.


Le Qudis da rîjeniy Deste Rast le İsrâyîl xopîşandanekîy saz da le dijîy rêkkewtiniy Ereb-İsrâyîl u xopîşandranî diruşmiy “Xakiy İsrâyîl le metîrsî da ye” yan beriz kirdibuwewe.

Parlemeniy Iran beyanêkiy derkird u rîsway em rêkkewtiney kird, herwiha daway le hikûmetiy Iran kird ke neka le rûy diplomasîyewe bawer be İsrâyîl bîhêne. Le rastî da Iran le saliy 1949 da daniy be İsrâyîl da hêrawe belam hîç pêwendiyekîy diplomasîyî legel nebes-tuwe.

## Yeltsîn li Rûsyayê darbe kir

**Nûçeyen Derve**- Serokê Rûsyayê Borîs Yeltsîn, roja 21’ê İlonê di televizyonê de daxuyand ku, wî parlementoyê fesih kiriye. Yeltsîn di axaftina xwe ya televizyonê de daxuyand ku, ji îro pê ve hemû desthelatdarîyên Kongreya Nûnerên Gel, Sovyeta Bilind û mebûşen kevin betal bûn û dê di 11-12 Kanûnê de hilbijartın pêk werin.

Pîştî vê axaftinê parlemento civiya û ev bîryar iptal kîrin, Yeltsîn ji, ji serokkomariyê dûr kîrin. Parlementoyê Aleksander Rustskoy ji bo serokkomariyê wekîl tayîn kîrin. Li ser vê yekê, di parlementoyê de ji gengesî derketin. Serokê Kongreya Nûnerên Gel (KNG) Ruslan Hasbulatov ev bîryara parlementoyê rexne kîr û ew wek xeletiyeke mezin nîrxand û daxuyand ku vê bîryarê nas-



Boris Yeltsin

nake. Hasbulatov ji bo parastina parlementoyê bang li gel kîr û ji parlementerîn dînyayê alîkarî xwest. Hasbulatov ji hêzên ewlekariyê ji daxwaz kir ku, vê bîr-yara neqanûnî nas nekin. Serokê KNG’ê ji bo greva giştî li karkeran jî bang kîr.

Bi vê banga Hasbulatov re li hin cihan ji bo piştgiriye livbâzî pêk hatin. Lider û dorê parlementoyê nêzîkî 3 hezar kes ji bo parastina parlementoyê xwepêşandanek pêk anîn. Dodgeha Qanûnê Bingehîn ji, darbeya Yeltsin li dijî qanûn nirxand.

Hikûmet, pistî guftûgoyan piştgiri da Yeltsin. Yeltsin beriya darbeya xwe ilan bike, Konsoli-siya Amerîka yê ji vê yekê agahdar dike. Dû re Amerîka jî bi beyanekê, piştgiri da darbeya Yeltsin.

# Greva bircîbûnê qediya

**Navenda Nûçeyan-** Greva bircîbûnê ya rojnameya Özgür Gündem'ê ku ji bo protestokirina pest û tehdîyên li ser rojnameyê, daxwaza radana wê û windakirina nûcevana wê Aysel Malkaç, bi awayekî dorvegerî li Komeleya Mafen Mirovan a Stenbolê di 23'ye Tebaxê de li dar ketibû, pişti 31 rojan qediya.

Di 21'ê Tebaxê de li KMM-S (Komeleya Mafen Mirovan a Stenbolê) Cigirê Berpirsiyarê Giştî yê Özgür Gündem'ê Ferda Çetin, bi daxuyaniye çapemeniyê diyar kir ku, êrîş û pêkutî ne ji kesen nediyar tê, ji walî, midûrê emniyetê û ji polisan tê. Ferda Çetin axaftina xwe wiha domand: "Wekî ku hikûmet bûyeran berevajî dike, ev êrîş ne "kiryar nediyar" in, ji dewletê bi xwe tê."

Ferda Çetin balê kişand ku, dema hin nûce di Özgür Gündem'ê de têne weşandin, li diji wan doz ji aliyê dozgeran ve têne vekirin û ev helwest jî wek bîryareke siyasi nirxand. Cigirê Berpirsiyarê Giştî yê Özgür Gündem'ê diyar kir ku, ew dê karibin xwe li hemberî êrîşen dewletê yên nû rabigrin.

Ji xebatkarêن Navenda Nûçeyan ê Özgür Gündem'ê Sezaî Sarioğlu jî nêrîna xwe diyar kir ku, li herdu welatan ji kesen dijraber (mûxâlîf) hene, di dema greva xwebirîhiştin de ev yek xwe daye nişan û bi vê livbazîya xwe di dîroka çapemeniyê de livbazîyek



Greva bircîbûnê ya Gündem'ê di roja 31. de qediya.

cihêreg dane. Her wiha di dawiya pest û pêkutîyan de Gündem ji riya xwe averê nebûye û hê jî weşana xwe didomîne.

Hunerwend Ferhat Tunç jî, Gündem'ê wek dengê gelê Kurd nirxand û bêdengmayîna raya giştî ji protesto kir. Li ser navê Sendikaya Çapemeniya Alman jî ku ji bo dozêni li diji rojnameyê hatine vekirin bişopînin hatine Stenbolê, Rudolf Burger dane nişan ku, ji bo protestokirina radana Gündem'ê li vir in û radana rojnameyê ji wek bêdengkirina hêzên demokratik nirxandin.

Li gorî ku hate daxuyandin, dê ji bo dîtina Aysel Malkaç serî li Komîsyona Mafen Mirovan a Ewrûpayê ji aliyê ebûqatê Gündem'ê ve bê dayîn û amadekariyê vê serîlêdanê didomin.

Aysel Malkaç di 7'ê Tebaxê de li nêzîki navenda rojnameyê ji hêla polisîn sivil ve hatibû girtin û heta niha jê hay û agah nayê standin. Her wiha hêzên emniyetê ji girtina wê ya ji aliyê polisan ve napejinîn.

## DAWEYÊN GÜNDEM'Ê TALOQ BÛN

Sê daweyên ku ji bo radan û ceza-

kirina rîvebirênen Gündem'ê hatibûne vekirin, li ser daxwaza ebûqatân ku ji bo parêziyê muhlet xwestin, hatin taloqkirin.

Dozêñ ku li diji rojnameya Özgür Gündem'ê hatibûn vekirin, bêrawestan didomin. Di 21'ê İlönê de li Stenbolê li Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê -2'yan sê dozêñ din li hemberî Gündem'ê û li hemberî berpirsiyaren nivîsaran ê kevin Işık Yurtçu, xwediyê wê Yaşar Kaya ku niha li Enqereyê girtiye û İsmail Beşikçi ve bûbûn, li ser daxwaza ebûqatân hat taloqkirin. Ebûqatân rojnameyê ji bo parêziyê ji dadgehê dem xwestin.

Hersê dozêñ ku vebûne, cezakirina berpirsiyaran û ji 3 rojan ta mehekê rawestandina weşanê dixwazin taloqî 11'ê mehâ Mijdarê ya sala 1993'an bûn.

Di dadgehê Gündem'ê de piştgirî û çavdêriya saziyên demokratik û çapemeni yê Ewrûpî tevi xwendevan û alîgirê rojnameyê balê dikişand. Hin ji heyet û berpirsiyaren saziyên demokratik û çapemeniyê ev bûn: Ji Yekîtiya Sendikayê Alman Rudolf Burger, ji Delege yê Sendikaya Çapemeniyê Beate Berg, Serokê Yekîtiya Rojnamevanen Alman Hans-Otto Wiebey, Nûnerê IFJ'ê, ji Holandayê Leena Paukky, ji Baroya Londonê û Projeya Mafen Mirovan a Kurdistanê Ebûqat Jane Connors.

## Zanîngeha Azad bi fermî damezirî

**Navenda Nûçeyan-** Unîversîteya Azad (Özgür Ünîversîte) ku sala par li Enquerê dest bi çalakiyên xwe kiribû, bi awayekî fermî hat damezirandin. Mureceata ku hefteya berê li walîtiya Enquerê hatibû kirin, hat pejirandin.

Di nav damezranêren Zanîngeha Azad de Dr. İsmail Beşikçi, Doç. Dr. Yalçın Küçük, Dr. Fikret Başkaya û Dr. Kadîr Cengîzbay hene. Li gor daxuyaniya nişkî ya Komeleya Pêşvebirin û Avakirina Zanîngeha Azad, ji bo serokatiya Zanîngehê Dr. Fikret Başkaya hatiye hilbijartin.

Armanca damezrandina Zanîngeha Azad wiha hat daxuyandin: "Ji bo pêşveçûna zanist û xebatêñ zanistî bi awayekî serbest, ji navê rakirina hemû astengên hiqûqî li pêşîya hilberîna zanistî, ji bo pêşvebirina akademîk, zanistî, enteletuelî ya endaman û ji bo Zanîngehê kârîbe li gorî armancêñ xwe bixebite, vekirina rê û başkirina rewşê."

Li Zanîngeha Azad, ne diploma tê dayîn û ne jî azmûn (îmtihan) têne kirin, di gel vê yekî xebatêñ xwendevanan, tezen wan, semîner û performansên wan girîng têñ dîtin.

Di daxuyaniya nişkî de tê diyarkirin ku, amadekarî ji bo avakirina fakulteyekê li Stenbolê tê kirin. Her wiha dersdayîna mamosteyan jî, li gorî dildarî tê kirin û mesrefa wan jî bi alykariya xwendevanan tê temînkirin. Qeydên pêsin di 20'ê İlönê de dest pê kirin û dê hîndekarî jî di 15'ê Cotmehê de dest pê bike.

## Mezintirîn pişkinîniy çek le Iraq da

### (Sorani)

**Nûçeyen Derve-** Netewe yekgirtuwekan hendê firokey hêli-kopteri yê Eraq henard, em firokane kerestey taybetiyan legal daye bo pişkinîn û dozînewey tîşkiy nawkeyî.

Bexda, kariy em firokane daye dilniya debê le barey ewey em firokane tîşkiy Lîzer bo kuşîniy Sedam be kar nahêniñ.

Ew komîteyey taybeta be damalîniy çekiy tûnaker le Eraq,

niyaziy waye pitir le 100 pispor legel kotayı hatinî em mangewi binêrête Eraq. Şayaniy gutine ke em komîteye lem maweyeda gewretirîn kariy pişkinîn le Eraq le diway seriye kerdawewe, encam dedat.

Netewe yekgirtuwekan le dilerawkey ewe daye ke Eraq nizikey 100 müşegiy coriy Scod'iy şardotewê.

Pisporaniy UN sergermiy e-wen şîwêniy çekiy kîmiyawî û nawkeyî le Eraq be yekcerekî bidoznewe û lenawîyan biben. Eme

le layek le layekiy tirewe le sere-tay mangiy dahatû da Ralif Ekiyos serdanîy Eraq dekat û legel Tariq Ezîziy Cêgiriy Serokwezîra-nîy Eraq dekewête wituwêjewe le pênew dananiy çawdêriyekî direjxayen le ser twanistîy çekdarîyî Eraq.

Le layekiy tirewe kompaniyyey newtiy Kiwêtiy 4 hezar milyon dolar qerziy le ser Eraq kirduwe be mal û bemeş sercemiy ew qerzaney le diway dagîrkirdîniy Kiwêtewe dikewne ser Eraq debete 200 hezar milyon dolar.

## 26 qaçaxçî qetil kirin

**Welat, Hewlêr-** Roja 18'ye İlönê li Hewlêre Wekilê Wezirê Karê Avakirinê bi êrîseke kiryar nediyar hate birîndarkirin.

Li gorî nûçeyen rojnameya Kurdistana Nwê, Wekilê Wezirê Avakirinê Teyîp Abdulcebar şeva 18'ye İlönê li ber Hotêla Kutika Bakir ji aliyê hin êrîşkaran ve hate gullebarankirin. Teyîp Abdulcebar bi vê êrîşê birîndar bû.

Li gor agahiyan, kesen êrîşkar ajanen Sedam in.

Roja 22'ye İlönê li ser sinorê başûr û bakurê Kurdistanê di du bûyeran de 25 qaçaxçiyen Kurd ji aliye hêzên dewleta Tirk ve hatin

qetilkirin. Büyera yekemîn şeva 21'ê İlönê li berava Qerewila diqe-wimî. Dema ku grûbek qaçaxçî di sinor re derbas dibin, dikevin kemîneya leşkerêñ Tirk û heşt kes ji wan tênu kuştin. Evara 22'ye İlönê cenaze anîn Zaxoyê. Çar kes ji wan ji herêma Soran, çarê din jî ji Behdînanê ne. Kesen ku ji aliyê leşkerêñ Tirk ve li ser sinor hatine kuştin navêñ wan ev in: Hesen Spîndarî, Husêñ Dozkî, Azad Dihokî, Emer Sindî, Şûlî Broskî, Bostan, Enwer, Mihemed û Mesûd Mangêrî jî birîndar e.

Li aliyê din, eynî şev li rasta gundê Dûrnasê grûbek qaçaxçiyen

din jî ketin kemîneya leşkerêñ Tirk. Ji vê grûbê jî 18 kesen din hatine qetilkirin. Ji vê grûbê yekî birîndar niha li nexwesxaneyâ Di-hukê radîzê, bes dîsa polisîn hikûmeta Başûr nehiştin ku em xwe bigihînîn nexwesxaneyê da ku em jê agahdariyê dorfirer bistînîn.

Di 22'ê mehê de saet li dardorê heşt û nîvî évarê komek qaçaxçiyen din ketin kemîna leşkerêñ Tirk. Büyler li gundê Toqyan nêzîki Silopî li ser sinor qewimî, 4 qaçaxçî hatin kuştin. Cenazeyê wan di destê leşkerêñ Tirk deye û navêñ wan nehat hînbûn.

# Peyivînek bi çavan

**Azad Kılıç**

Mirovê diltenik. nikare her tişti ragire. Weke çawa qızek ji xor текî dil digire û pê re dilopek germ diniqute nava wê. Binyada kesan, heta radeyekê xwe kontrol dike, li piştî radeyekê êdî ew ne ew e, tê guherandin û dibe tiştekî din.

Rojek ji rojên jiyanê bû, weke rojên din xwe dubare dikir. Germa havînê, havîna Kurdistanê weke dojehê bû. Îsal zad dereng hatibûn çinîn. Her sal kesen xizan ji xwe re li zad digerian. Lî îsal hinekên din ji digerian. Ne xizan ne ji badik bûn. Xwedî mal û xwedî zad bûn.

Li devê derî rûniştibû, jînek û sê zarok. Jinikê digot: "Em ne feqîr in, lê dewletê gund û zadêne me şewitandîn; em ji weke we xwedî mal bûn."

Gava çavê min li çavê wê ket, ji nişka ve mûyên min gurzî gurzî bûn. Weke ku yek ava sar li min bike. Heta wê gavê qala şewitandina gundan dihate kîrin, lê ji min re weke xewnekê dihat. Yek ji wan gundiyan ku gundêne wan şewitandibûn û sê zarokên wê niha li ber çavêne min bûn. Cara pêşî min rûyê xwe jê vegerand, lê bi dû re min li nava çavêne wê nihêrî. Bi çavan min got:

-Merheba dayê

-.....!

-Tu bi xêr hatî.

-Xêra Xwedê li te be.

Bersiveke sar. Ez fikirîm, ka jê çi bipirsim. Edî bi hezarân jînen Kurd bûbûn koçer. Ev jî yek ji wan bû.

Ji warê xwe bidûrxistin, ji kuştinê ji dijwartir bû. Jinikê got:

-Kesen ku mirin ji xwe re xelas bûn. Lî yê mayî...!?

-En mayî!?

-Erê, yê mayî ji li bajaran, du-sê mal li ser hev û din, di xaniyekê de ne. Hinek jê, di kolanêne bajaran de bê xanî mane.

-Hûn?

-Em ji...

Zarokên bi terbiye, ji rewş û tevgera xwe diyar bûn. Ez fikirîm. Gelo jînen Kurd gişt wiha ne? Peyva wan li rû, peyva wan ji dil.

-Mêrê te...?

-Mêrê min û qîzeke min di şewitandina gund de bîrindar bûn, li nexweşxaneyê ne.

Wer xuyabû ku debara

her roj li ser zarokên xwe xwîn digirî. Li hember deveren din stûxwar e. Lewre rojekê xwe, bi zarokên xwe re derbas nekiriye.

Jinikê got:

-Belê.

-Erê lawo, kurmê darê ji darê ye, yan na dê qedera me ne wiha bûna.

"Kurmê darê ji darê ye", gotinek bi bingeh. Zarokati-

min qala koça pêşmergeyên Kurdên Başûr ji me re dikir, digot: "Ev roj li pêşîya me ye ji". Niha ez difikirim ku, tecrûbeyên kevin, bêşik ji bo pêşerojê dibin neynik.

-Niha kes ji we dikare here gund?

-Na; yê ku diçe ji hêla leşkeran ve tê girtin. Têr ji kutanê dixwe û di rewşa mirinê de ew berdidin. Hin ji wan ji dimirin. Di televizyonê de ji dibêjin "Terorist hatin kuştin." Çavên jinikê li cihekî eliqibûn, nizanîm bi çavan difikirî? Lî na; çav bi dil dişêwirî, dil û mejjî têkiliyek danibûn. Mejjî hêdî hêdî di xewê re diçû. Biranînê jinikê xwe didane der, dema qîzaniya xwe dihanî bîra xwe. Wê dilketibû xortekî. Di ciwaniya mirovan de dilê mirov dipeke, yê wê ji dipekiya. Hirbiya keskesor li serî, xuşîna guliyen sor, hisê xorstan ji serê wan dibir. Bejinzirava dilpekî, di ber xwe de vê stranê digot:

Ciyayê Kurdistanê şîn e  
Konê bavê min rebena  
Xwedê

Li ser çar stûn e  
Delalê dilê min, vê sibehê zûwer ba min, meşkê bidel-



malê ew dike. Di civaka Kurdan de, dema mîr bimire, jin li ser zarokên xwe rûdin. Ango xwe emirqufî dike. Gava ku mirov li ser vîtişti difikire, dîroka gelê Kurd jî tê bîra mirov. Ev fedekariya jinan, bûye temînata hebûna gelê Kurd jî. Jinik:

-Me ev edet ji bav û bavîrên xwe dîtiye. Cihê mîr lê tune be, jin mîrê malê ye.

-Li gorî min bihîstiye, li cem we cihêne ku leşker digirin ser, xanî û gundan dişewitînin, dest diavêjin namûsa xelkê jî?

-Hinek keçen me, ji bo xwe ji vê yekê biparêzin, xwe ji zinaran avêtin, hinek derketin serê çiyê û bûne şervan. Edî namûsa me di dilê me de ye. Em li ku dijimin dibînin, kirinêne wan tene bîra me; nayê ji bîrkirin...

Jiyan çiqas ecêb e. Niha mîrê xwe yê li nexweşxaneyê difikire. Birîna wî xedar bû. Gelo ev rewşa ku tê de ye qedera wê bû? Kê zanibû ku dema ji diya xwe bû, dê têkeve vî halî. Belkî, diya wê zanibûna ku wê di vî halî bikeve, ew çênedikir.

Ev cografyaya birîndar,

-Tu bi galegal î, bav û bavîrên me ji di vî halî de jiyanâ xwe derbas kîrin. Ma Cemîlê Çeto nayê bîra te? Heyfa mîrê çê, egîde mîrxa...

ya min hate bîra min. Dengbêj di stranê xwe de her ji bîskê digotin: "Erêê xayîn..."

Ev ne koça pêşî bû ku, bi serê Kurdan de dihat. Bavê

## Daxuyanî

Welatparêzen hêja!

Ziman û çanda me, şaxek ji dara Kurdistanê ya neteweyî ne. Şaxa ku xwînê dide giyanâ Kurdayetiye û pêbihara wê geş dibe û dixemile. Bê çawa hebûna mirov bêlaş û giyan nabe, wisa ji netewe û welatek bêçand û ziman nabe.

Ziman hêlinâ dîrok, tore, ramyari û çandê ye. Ziman pêdiviyeke jiyanê ye, jiyan û hebûn bêyî wê nabe, hebûn bi xwe ye.

Bi sedan salan dijminenê Kurd û Kurdistanê giraniya şerê xwe dane ser zimanê Kurdi. Lî dîsa ji gelê me yê qehreman, dayîk û bavên Kurd bi gernasî ziman û hebûna me parastine. Şkeft û berqefen Kurdistanê ji bo me bûne parastgehêne hebûnê. Mîna her koçberen dîrokî, iro ji ev ciyayen pîroz hebûnan diafirînin. Di wan şkeft û bergefân de plan û programa damezirandina Komara Kurdistanê tê danîn.

Gelê Kurd ê welatparêz ê li Ewrûpayê!

Pêngaveke din edî em digihin serxwebûn û azadiya xwe. Gavên vê dawiyê ku me bêveger avêtine, dawiyê bi şahiyê diqedînin. Xewnê kûr ji tariya şevê xwe dirêji ronahiya rojê dikin û bi rastiyê şâ dibin. Şoreşa Kurdistanê edî fêkîyen xwe yek bi yek jê dike. Ji bo ku em layîqî mirovahîya xwe bin, pêwist e em bibin layîqî şoreşa xwe. Em xwe ji bo Komara Gelê Kurdistanê amade bikin. Di her hêlî de em xwedî li xwe û li nirxên xwe yê neteweyî derkevin û di serî de em xwedî li zimanê xwe derkevin. Lewre zimanê me hebûna neteweya me ye.

Zarok hêviya pêşerojê ne. Dil û cegerê me ne. Kezeba me ya ku li ser erdê dimeşe zarokên me bi xwe ne. Her tişt ji bo wan tê kirin. Zarokên me gulên hebûna me ne. Bi hev re emê wan bi şîrê Kurdayetiye mezin bikin. Bi zimanê dayîka wan mezin bikin. Ew zimanê ku bi mîhtina şîrê dayîka xwe re fêr dibin, emê zarokên xwe li ser çand û toreyâ xwe mezin bikin. Wan biparêzin û bibin xwediyen wan.

Ji bo alîkariya we, ji bo xwedîderketina li zarokên we, Yekîtiya Mamosteyen Kurd (YMK) ava bûye. Piştgiriya mamosteyen xwe bikin. Ji bo ku zarokên we bibin hêviya pêşeroja we, bibin kulîlkên Kurdistanâ we. Bi hev re emê gulên gulîstana xwe, hêviya jiyanâ xwe, zarokên xwe bi şîrê Kurdayetiye, bi ziman, tore û çanda Kurdi mezin bikin.

**Yekîtiya Mamosteyen Kurd**



Hûrkolîna li ser mirovan ji ya li ser pirtûkan pêwistir e.  
La Rochefoucauld

# Were ser riya heq...

Tê gotin ku, dema nefikirina Ermeniyan (li aliyê Semsûrê gel dibêje "Dema Qelfe" ji ber ku, Ermenî ref bi ref nefikirine.) serdestên Tirkan ferman dane ku, kesen neyên ser riya heq, ango ser riya ola İslâmê wê bêñ kuştin. Li ser vê yekê, yekî bêhiş ji gundiyyêñ Semsûrê Ermeniyekî cinarê xwe dike bin xwe, kérê dide stuyê wî wiha diqîre." Kafir were ser riya heq, yan na ez dê serê te ji laşê te bikim." Mêrikê reben ji tirsa dilerize, wiha dibersivîne: "Ezbenî riya heq bêje ez werim ser!" Gundî bersiveke bi vî awayî napê û bêhnteng dibe, dibêje: "Wele viya ez jî nizanîm, bes divê ferman bê cih."

Îro rewşa gelek nivîskarêñ Tirk ji dişibe rewşa wî gundiyyî. Bi xwe li ser pirsgirêka Kurdî tiştekî nizanîn, lê ji bo fermaña serbazên artêşa Tirk bînîn cih zore didin xwe. Niha pişti ewqas şêwrê fêm dikan ku li gorî agahiyêñ çewt, şîrovekarî kiriñe. Berpirsyarê rojnameya Hürriyet'ê Oktay Ekşî bitirs dibêje: "Dibe ku, rêvebirêñ dewletê heta niha agahiyêñ çewt dabîn me." Li ser vê yekî şêwirmendê Demîrel ê kevin û sernivîskarê Turkish Daily News'ê İlñur Çevik ji dibêje ku, wan ev rastî ji mêt ve anîye ziman, ji ber ku,



desthilatdarêñ dewletê her tim li ser dawîlêanîna PKK'ê dabaş dikan, lê ev tişt cêna-be. Her ku, "hêzêñ ewlekariyê" li hember gel çewt dilîvin, têkiliyêñ wan bi PKK'ê re xurt dibin. Lê ev zilam ji neheqbûna dewletê qet na-kevin gumanê. Ji lew re ji, di nava lehiya çewt liviyêñ dewletê de, tenê çend kîrinêñ "hêzêñ ewlekariyê" bala wan dikşîne û dixwazin bi wan rexneyêñ biçûk xwe ji gunehêñ şerê qirêji bifiliñin.

Ew têngîhîjin ku, dema serî gêj be laş bi rêkûpêk na-meşe û hemû zilm û zordarî di bin çavdêriya sermezinêñ

wijdan bêmêzin de pêk têñ.

Di şerê azadîxwaziya li hemberî metingehkaran de, hinek seretayêñ bingehîn hene. Yek ji van jî ev e, di gel gelek nebaşî yan hinek başiyêñ dijmin jî digihîje mirovan. Çewt livînêñ hêzêñ dijmin bi kérî mirovan tê û kesen neheq zehf çewtiyan dikan. Ev tiştekî xwezayî ye.

Divê ev nivîskar li ser nasîkirina mafêñ gelê Kurd ên neteweyî bifikirin, ne li ser qedandina PKK'ê. Yan na ew nikarin xwe ji xeletî û kujyariyêñ şerê qirêji bison û ew dê bi ber lehiya şoresha gelan bikevin.

**S. Berbang**

Jûjî...



Doğan Güzel

EZ DÊ VÊ CARE  
XEZALEH HEL BIKIM  
HAM...!

# TÎR

Musa Anter



## Armanca Apê Musa

Dagirkerêñ hov û paşverû dareke me ya a-zadiyê birrîn. Her gav fêkî dida, zivistan, payîz jê re tune bû. Tim bihar bû. Li rûyê me Kurdan dibişirî.

Apê Mûsa gîhişte armanca xwe ya pak. Ket nav karwanê pakrewenan û ji wan re serokatiyê dike. Fêkiyêñ wî tu car naqedin. Heya gelê Kurd bişî fêkiyêñ wî ziwa nabin.

Di xelasbûna gelê me de jî wek xelasbûna her gîli, du cure rê hene. Yek jê lûla tivingê ye, ya din jî pêñûs e. Herdu bi hev re gel radike ser piyan. Û îro li Kurdistanâ me ya şîrîn ev herdu rê jî dijmin xistine bin tirseke mezin. Dijminê me hov e. Şarezahî û mirovahiyê nedîtiye. Û nikare xwe li ber şerê tivingê bigire û di tengasiyê de ye. Dixwaze vê tengasiya xwe bi êrîşkirina ser mirovîn bêçek, veşere.

Berî her tişti em Apê Mûsa bêçek nahesibînin. Ew bi çek bû. Lewma dijmin ji wî tarsiya, ew şer-van bû. Heşte salan wî şer kir. Komara Tirkîye nizimkariya xwe bi kuştina mirovîkî 80 salî danî ber çavan. Rû-reşîya xwe wek her caran bi xwe pejirand. Hîn roja pêşî Wezîrê Karêñ Hundîrîn yê kevin İsmet Sezgîn digot: "Van qetlîaman nexin stûyê kontrgerîla. " Rast e, cihê ku dewlet lê hebe ne şerm e ku mirov bîbê-

**Apê Mûsa, mirovekî pir mezin bû. Mezinahiya wî, heyâ neviyê wî yê di dergûşê de hebe jî ew dê her hebe. Ramanêñ wî, rî li ber me vedike, dê vebike jî. Agirê di dilê me de wî pêxist, ev agir pêl dide, dê bide jî.**

**Bila Roma bêbext û tir-sonek vê rastiyê zanibin.**

**Yêñ ku bi şerê çekdarî nikarin, bi Apê Mûsa jî nikarin. Ev şer, şerê gel e. Şerê rizgariyê ye. Dê heyâ dawiyê bidome. Ev jî tiştekî xwezayî ye.**

je qatil kontrgerîla an jî hizbîkontra ye. Ez dibêjim qey wezîrê komara Tirkî, dixwest vê bibêje: Edî rûyê wî negirt bibêje "Ev kûçikêñ me ne". Malek bi navê kûçikê xwe bê nasîn, ev mal jî dibe mala kûçikan. Ji serok û xwedîyê van dipirsim, "Ne wisa ye?"

Apê Mûsa, mirovekî pir mezin bû. Mezinahiya wî, heyâ neviyê wî yê di dergûşê de hebe jî ew dê her hebe. Ramanêñ wî, rî li ber me vedike, dê vebike jî. Agirê di dilê me de wî pêxist, ev agir pêl dide, dê bide jî.

Bila Roma bêbext û tir-sonek vê rastiyê zanibin. Yêñ ku bi şerê çekdarî nikarin, bi Apê Mûsa jî nikarin. Ev şer, şerê gel e. Şerê rizgariyê ye. Dê heyâ dawiyê bidome. Ev jî tiştekî xwezayî ye.

Edî gelê Kurd hişyar bûye. Riya xwerizgarkirinê fêr bûye. Xaka ku Apê Mûsa li ser hate dinyayê, avî bû. Dar û ber bi xwînê têne avdan, birîna van daran ji bo metingehkaran neçare ye. Wan rihêñ xwe di erdêñ Kurdistanê de berdan e.

Gotina min ji gelê Tirk re jî ev e: Nekevin defika dewleta xwe ya hov, ev ne riya felatê ye.

Gelê Kurd dê her bijî, azadiya me jî nêzîk e. Bergîdana hertiştî heye, ya azadiyê jî pakrewenî ye. U şehîd namirin.

**Jan Gîr**

# Hebûna Partiya Demokrasiyê di meclîsê de tê munaqşekirin DEP di pêvajoyeke girîng de

**Navenda Nûçeyan-**Rêvebirên Navenda Partiya Demokrasiyê û serokên DEP'ê yên bajaran, roja yekşemê ji bo biryareke girîng li Enquerê dicivin. Dê di vê civînê de li ser pest û pêkutiyêni li ser DEP'ê bê rawestin, şertên nû bêne nirxandin û bernamayêni têkoşîneke berfirehtir bê guftûgokirin.

Di vê de ji bo awayêni têkoşînê du dîtin derdikevin pêş. Yek ji van, vekişîna mebûsên DEP'ê ji parlementoya KT'ê ye. Ev dîtin bi pirranî ji aliyê hêz û kesen ku ne di nav DEP'ê de ne tê pêşkêskirin û di nav pirranya endamên DEP'ê de aligir nabîne. Di nav DEP'ê de bi pirranî mayîna di meclîsê de tê pejirandin, lê ji bo berfirhekirina têkoşîna demokrasiyê li ser têkoşînê cihêregi

ji tê rawestin.


Bi kuştina Mehmet Sîncar û girtina Yaşar Kaya re, Partiya Demokrasiyê mecbûrma ku, politikayêni xwe ji nû ve binixîne. Ji bo râlibergirtina êrîşen dewletê yên li hember DEP'ê û hêzên demokrasiyê û ji bo tesbîtkirina politikayêni nû di hemû qadan de guftûgoyen girîng pêk tê. Dîtinêni cihêregi, ji aliyê hêzên cur be cur ve tene pêşkêskirin. Tev pirsa "divê DEP ci bike" munaqşe dikin. Hêzên ku ne di nav partiyê de ne, dibêjin bila mebûs bi lez ji meclîsê vekişin. Rêvebir, mebûs û endamên DEP'ê bi pirranî li hember vekişîna ji meclîsê dertê.

Dawî dê endam û rêvebirên DEP'ê biryara vê yekê bidin. Lê ji bo em xwende-

vanen xwe ji dîtinêni cihêregi agahdar bikin, mebûsên gelek kesan girtin û niha van dîtinan pêşkêskidikin.

## İsmet Serîf Wanî

Qetilkirina rewşenbîr û mebûsên Kurd li Tirkîyeyê cinayetên tertîpkirî ne. Ev dasal in ku, ev cinayet didomin û bi destê organêk dewletê



İsmet Serîf Wanî

karin xwe ji parlementoyê bidden alî. Wê hengê ji bo mebûsên kêm wê hilbijartinek çêbibe. Ji herêmén mîna Amîd, Şîrnex, Îlo, Mîrdîn, Mûş, Wan û Sîrtê ku hin hevalîn din bêñ hilbijartîn û carêke din werin meclîsê, ji aliyê siyâsi ve tiştekî pirr girîng e; yanî wateya vê helwestê ji aliyê siyâsi ve mezin e.

Sondxwarina mebûsên nû hilbijartî, bi rastî problem e. Mebûsekî Kurd lazim e li gor Qanûnê Bingehîn a Tirkîyeyê sond nexwe. Ji ber sondnexwarinê, mebûsên Kurd dikarin ji parlementoyê bêñ dûr xistin. Divê mebûsên Kurd ji bo vê ji hazır bin.

Ger dewleta Tirk li bajarêni Kurdan nikaribe hilbijartînê li dar bixe, ev jî, ji aliyê siyâsi ve xwedî wateyeke mezin e.

Dema xwe ji parlementoyê bikşînin, mebûsên Kurd dikarin raya giştî ya Kurd Tirk û dînyayê ji sebebên vê rewşê agahdar bikin.

2. Mebûsên DEP'ê dikarin dev ji parlementoyê berdin û DEP jî nekeve hilbijartînê. Ger hilbijartîn bêñ protesto-kerin û li Kurdistanê besdariya hilbijartînê %50 këmtir bibe wê hengê wê bê qebûlkerin ku, mebûsên ji partiyen din nikarin gel temsîl bikin. Ev rewş jî, ji hêla siyâsi ve xwedî wateyeke mezin e.

3. Mebûsên DEP'ê dikarin xwe ji parlementoyê venekîşînin, lê wê bêrawestin protesto bikin û bibêjin." Ta ku ev û ev şert neyên cih em nayêni parlementoyê..." Di pêvajoya protestoyê de dikarin li ser hemû kirin û politikayêni dewletê yên li hember gelê Kurd û saziyên demokratik danezaneke xurt biweişînin. Ger di vê pêvajoya protestoyen de, mebûs ji parlementoyê bêñ dûrxistin û ji mebûsiyê bêñ avêtin jî, ji aliyê siyâsi ve dibe xwedî wateyeke mezin.

DEP ji van her sê xalêni li jor bêdudîl kijan pêk tîne bîla bîne, wê dewletê bêxe nav rewşekî dijwar. Di van şer-ten de dewlet wê bi pey mebûsên DEP'ê bikeve, kesen din bêxe navbera xwe û wan da ku mebûsên DEP'ê bi berdewamî herin meclîsê.

**Ahmet Akkaya** (Midûrê Navenda Nûçeyan û Özgür Gündem'ê)

DEP bi armanica ku ew gemaroya (ablûqaya) HEP bi xwe jiyabû bişikêne hate avakirin. Her çiqas DEP, bi taybetiya naveroka xwe ku ji



Ahmet Akkaya

çend hêzên Kurd hatîye pê, zorê dida gemaroyê jî; lê gemaroya dewletê ya hiqûqî û der-hiqûqiyê neşikand. Zêdekirina zemînên qanûnî li aliyê din, nehiştin ku wan biparêze jî. Li gorî van enca- man DEP ketiye tengasiyekê.

Bakaranîna kursiyê meclîsê em deynin aliyê din, pişti kuştina mebûsê Mîrdînê Mehmet Sîncar ketin rewşekî wisa ku, nikarin herin herêmén xwe yên jê hatine hilbijartîn. Ji ber vê yekê, ji bili ku di nav gel de xwe xurt bike û berê xwe bide qadêñ qanûnî tu şansekî wê nîn e. Ji bo vê ne hêvîbirrîn û ne jî rewşa niha rîga (alternatif) ye. Tek çare, ji nû ve di nav gel de xwe xurtkirin û pêşî meclîs, zordayîna hemû qad û waran e.

**Munîr Ceylan** (Serokê Giştî yê Şendîqaya Petrol-İş'ê)

"Hebûna DEP'î bi têko-



Munîr Ceylan

şînê hatîye bidestxistin"

Bergîdana bidestxistina maflîn demokratik û azadiye li tu derê dînyayê ne biçük bûye. Li welatê me ji bêyi dayîna bergîdanen (bedîlen) mezin kes nikare bifikire ku bigihîje armancekê.

Weke hemû gelan, gelê Kurd jî, ji bo bikaribe bibe xwedî maf û azadiya xwe, divê bi vî awayî ji xwe bawer, bi biryar, bi rîexistindarî dikare têkoşîna xwe bidomîne.



İsmail Beşikçi

## ROJEVA WELÊT

### Têkoşîneke bi hêztir divê

**P**artiya Demokrasiyê (DEP) roja yekşemê ji bo biryareke dîrokî, li Enquerê civîneke bi giştî pêk tîne. Dê di vê civînê de, rîvebir û serokbajarêni DEP'ê, ji bo politikayêni nû dîtinêni xwe pêşkêş bikin. Di vir de, tişte girîng, vekişîna ji meclîsê yan jî mayîna tê de nîn e. Tewra girîng ew e ku DEP politikaya xwe bi giştî û ji nû ve binixîne, kîmasî û nexweşiyêni xwe tespit bike û ji bo têkoşîneke bi hêztir refen xwe zexim bike.

Bi tundkirina êrîşen ser DEP'ê û hêzên demokratik re, li Tirkîyeyê demeke nû dest pê kir. Dewlet di çareserkirina pirsgirêka Kurdî de, ji xwînrijiyê pê ve rî nas nake. Niha jî berê xwe daye hêzên ku di warêni demokratik de têkoşînê dikin. Di vir de he-defa mezin DEP e. Kuştina Mehmet Sîncar û rîvebirên partiyê, girtina Yaşar Kaya diyar dike ku, dewlet dixwaze DEP'ê ji qada demokratik tecrît biki. Politikayêni ku li hember van êrîşen dewletê dê bêne tespitkirin jî, divê li gorî wê bin. Di vî warî de jî karê girîng ê DEP'ê ye. İro, ji her rojî bêhtir pêdivî bi yekîtiyê heye, ji bo vê jî divê hêzên demokratik li hev bicivin û piştgirîyen xwe xurttir bikin.

Di vê pêvajoya ku DEP di amadekariya tesbîtkirina politikayêni nû de ye, bi giştî hemû hêzên demokratî û kesen pêşverû xwe tevî vê guftûgoyê kirin. Her yek li gorî xwe li dû pirsa "divê DEP ci bike" digere. Di nav hêzên ku dibêjin bila DEP ji meclîsê vekişe de jî dîtinêni cihêregi xwe diyar dikin. Lî divê neyê jibîrkirin ku, ev hêzên li derveyî DEP'ê, weke vê partiyê bi êrîşen dewletê re ne rû bi rû ne Lewre jî dê biryara rast dîsa ji nav DEP'ê derkeve.

Tevî vê em bawer in ku, dê dîtinêni hêz û kesen cur be cur, li ser vê mijarê nîrînê xwendevanan ron bikin. Bi vê baweriye jî, em van dîtinêni cihêregi pêşkêş dikin.

Wek Tirkiyeyê -kemasî, qedexe û rîlibergirtin hebin ji - li welatên ku lê demokrasiya parlementerî dixebite, xelekek rîexistinê ji, rîexistiniya siyasi ye. Divê mirov bikaribe têkoşinê li hemû qadê demokratik, her wiha li parlementoyê ji bimeşine.

Cihgirtina DEP'ê di meclisê de bi sînor û bi hejmareke hindik be ji, bîdestxistinê girîng e û divê biçük neyê ditin.

Delilê vê heqîqetê, êrîşen kesen ku neyarê demokrasiye ne, êrîşen wan ên li hember hebûna DEP'ê ya di meclisê de û li derive ye.

Armanca siftbûna êrîşen li dijî rîveberîn DEP'ê ev e: Ji ber xebatê DEP'ê yêni ji bo demokrasî û azadiyê wê defî qadê din bikin.

Divê bi hindikî DEP li hember van êrîşan bi qasî êrîşkaran bi bîryar be.

Çi dibe bila bibe, pêwist e qadê demokratik û qanûni bernede û amade be, bedelê bide û têkoşinê bidomîne.

Ev têkoşin ji bo rîzgirtina mafêni mirovan, ji bo civakeke azad û demokratik, perga-leke ku lê prensibîn hiqûqa gerdûnî hene, tê dayîn û divê bintûti (qet-i) ev têkoşin bi ser bi keve.

**Recep Maraşlı** (Berpirsiyarê Weşanê Komalê yê Giştî)

"Di parlementoya mêtîngehkaran de mirov nikare li hemberî mêtîngehkarîye têbikoşe"

Meclîsa Tirk, ne ya gelê Kurd e. Ev dezgeheke qanûncêkera mêtîngehkar e.

Mirov nikare di nav dem û dezgehîn mêtîngehkaran de bimîne û li gorî qanûn û qaydeyên wan li hember wan têbikoşe.

Di-meclîsa Tirk de dîrok dide nîşan ku, ji bo gelê Kurd

ji bili bîryarê qetliam, koçberkirin, pişavtin (asîmîlas-yon), takrîr-i sikûn, rîveberiya taybeti, hin bêhtir kedwarî, zîlîm û tehde pê ve tu tişt derneketiye û dernakeve ji. Her cara ku bi hêviyên nû û sebeban, parlementerizmê



Recep Maraşlı

derdixin pêş bi tenê ji têkoşina rîzgariya neteweyî ya Kurdistanê re xerabkariyê tîne.

Ji ber ku li wê meclisê li ser navê gelê Kurd hin mirov hene tê nîşandan ku, ew meclîsa hemd û vîna gelê Kurd ji dinînerîne (temsilîke). Bi vî awayî em heta iro hatin. Lîne meclîsa Tirk û ne jî hikûmetên ku ji wê dertên, tu yek ji wan hemdê gelê Kurd nikare binînerîne û ne meşrû ne. Vê yekê dîroka Kurdistanê ya bi xwîn û bijan gelek caran daye peyîtandin (îsbatkirin).

Tîştên ku ji du sal berê ve ye diqewimin tevî kuştina Mehmet Sîncar û hevalîn wî, êrîşen li ser merasima cenza-zeyê bi me da nîşan ku, kesen xweşbin çiqas di şâsiyeke mezin de ne.

Edî bi jîbîrkirina rastineyên dîrokî û siyasi, mezinkirina derfetên ku bi mebûsiyê bi dest dikeve, ji aliyê din ve windakirina girseyên gel ber-pîriyareke mezin e.

Divê mebûsên DEP'ê ji bo raya navneteweyî danezaneke pişkarbelav bikin ku, meclîsa Tirk ji bo gelê Kurd ne meşrû ye û ji meclîse ve-bîkişin. Divê hilbijartinan ji bo zemîna propagandaya antî-parlementer û antî-kolonializmê bikar bînin.

Vekişîna mebûsan ji meclisê, divê bi livbaziyê girseyî ji bê destekkirin.

**Serhat Özgür** (Unîversîteya Teknikê ya Stenbolê-Beşa Kompîtûrê)

Ji bo mirov bikaribe bibêje DEP divê politikayike çawa bimeşine, divê mirov li armanca avakirina wê û hîmîn ku li serê ava bûye binêre. Gelê Kurd ji bo mafêni xwe û daxwazên xwe yên mirovî di qadêni siyasi de bîne-ziman, DEP'ê wek nûner şandiye meclîsa Tirk. Bi gotineke din, gelê Kurd hilbijartînen giştî wek referandûmê qebûl kiriye û vîna (îradeya) xwe derxistiye holê.

Armanca DEP'ê ya ku di meclîsa Tirk de cih distîne û ya herî girîng ji ew e ku, po-lîfîkayê KT'ê yên der barê neçareserkirina pirsa Kurd de deşîfre bikin, di nav qadê demokratik ên navneteweyî û raya giştî de.

DEP iro vê wezîfea xwe pêk anîye. Yanî vîna gelê Kurd daye nîşan û KT'ê tecrit kiriye. Edî tu maneya ku, di meclîsa Tirk de bimîne nemaye. Di vê merhaleyê de gelê Kurd ji, di vê qadê de neçareserkirina pirsa xwe dîtiye û alternatif xwe -Meclîsa Neteweyî- derxistiye pêş. Divê mebûs guh bidin gelê xwe û ji bo bi her awayî KT'ê tecrit kiri, ji meclîse vekişin û di nav refîn gelê xwe de cih bistînîn.

**Doğan Eren** (Unîversîteya Stenbolê-Beşa Hiqûqê)

Di vî warî de hissiyat dibe sedemekî girîng ê çewt ji bo bîryarstandinê. Metoda herî rast li gorî min guftûgokirin e. Di vî warî de berîher kesî bîryara endamên DEP'ê girîng e. Büyera DEP'ê ji ber ku pirsa Tirkîyeyê hemû ye, ya xeynî endamên DEP'ê divê dîtina gelê Kurd û cîna karker a Tirkîyeyê ji bê stan-din.

Têkoşinêñ cînî û neteweyî, ne tenê bi metodêñ illegal têne meşandin. Dema mirov li dîroka siyasi ya dînyayê dinêre, di têkoşinêñ civakî de piştî bi demekê, girîngîya têkoşinêñ legal xwe derdixe pêş. Lî têkoşinêñ illegal ji, li ser bîngîhîn têkoşinêñ legal ava dibin. Ger têkoşîna gelê Kurd a neteweyî ji, di warekî tenê de bê hiştin, dê meh-kûm bibe. Divê ev têkoşîn, bi têkoşîna parçeyen din ên Kurdistanê re bibe yek. Ev jî têr nake. Divê bigîhîje cîna karker a Tirkîyeyê. Ji ber vê têkoşîna legal li cîhekî dest pê nake û li cîhekî naqede.

Li gorî şertîn ambargoyle, li Qilaban fabriqeya nan, serê malbatê mehî torbeyekî ard belav dike. Serokê Belediya Qilabanê Ömer Haçoğlu der barê ambargoyle de wiha axivî: "Ji demeke dirêj ve ye ku, ambargo li van herêman tê meşandin. Hemû xwarin û pêdiviyê me bi belgeyan tê standin. Ji bo vê ji destûra qeymeqam lazîm e. Ew gundênu ku cerdevanê wan nîn in, talûkeya birîbûnê xwe lê daye der".

zî biqede, girîng e. Piştî serfi-raziyê ji xwe legal-illegal bêmane ye.

Ji ber vê yekê, ez vekişîna DEP'ê ji meclîse çewt dibînim. Lî ev tişt dikare bê mu-naqşekirin. Divê navgînê têkoşinê bîn dewlemendki-rin. Bi cîna karker a netewe-ya din re tîfaq bê dayîn, pişt-giriya hêz û saziyên demokratik bê girtin û di pratîkê de bêne bikaranîn. Bi awayekî din ji, Beşîkçiyek bi tenê ne bes e. Divê hejmara Beşîkçîyan bê zêdekin.

### ENDAMÊ DEP'Ê ÇI DIBEJIN?

**-Faruk Söylemez** (Serokê DEP'ê yê navçeya Îskender-rûnê):

Pêwist e ku em di parlementoyê de bimînîn û têkoşîna xwe di bîngîheke demokratik de bidomînîn.

**-Saît Bingöl** (Endamê Rêveberiya DEP'ê yê Mazra-Elezîz-yê):

Ne pêwist e ku endamên DEP'ê ji parlementoyê derkevin, ger ku derkevin, dê êrîşen dewletê yên li ser wan zêdetir bikin.

**-Nesîmî Genlik** (Endamê Rêveberiya DEP'ê yê Dêrîsimê):

Emê li ser riya demokratik bi girîngîyeke mezin biseki-nin, ger ku riya me bê girtin, em dê li çareyeke din bigerîn.

**-Veysî Kavagül** (Serokê DEP'ê yê Navçeya Dêrikê):

Lazim e DEP beriya istîfayê ji Neteweyen Yekbûyî (NY) parastînî bixwaze û têkiliyên xwe bi hêzên demokratik ên Kurd, Tirk û ên din re xurt bike.

**-Şehmus Çağrı** (Serokê DEP'ê yê Mêrdînê):

Ji iro pê ve têkoşîna DEP'ê ya di parlementoyê de pîr girîng e. Çend kes di meclîse de bin û çend kes ji bi rîexistina NY'ê re têkiliyên partiyê xurt bikin wê çêtir bi-be.

**-Sükrü Akbal** (Serokê DEP'ê yê Nisêbînê):

Lazim e ji parlementoyê neqetin, bîryarê bi serê xwe nedîn.

**-Edîp Yıldız** (Serokê DEP'ê Diyarbekirê):

Ta ku alternatifek çêtir ji bo DEP'ê çênebe, veqefîna ji parlementoyê ne pêwist e.

**-Eyüp Karakeçeli** (Endamê Meclîsa DEP'ê ya Rihayê):

Mayîn an nemana DEP'ê ya di parlementoyê de ewqas-ne girîng e. Ew Kurdan di parlementoyê de naxwazin.

**-Muhsîn Melik** (Serokê DEP'ê yê Rihayê):

Em naxwazin DEP ji parlementoyê veqete, ji xwe daxwaza dewletê ji ev e.

**-Av. Mahmut Vefa** (Serokê DEP'ê Wêranşarê):

Ev mewziya ku ketiye destê me rast e ku em wê bidin dewletê. Divê em neyîn xapandinê

**-Seyît Ahmet Öcalan** (Serokê DEP'ê Xelfetiye):

Lazim e DEP ji parlementoyê veqete û biçe li Ewrû-payê dengê xwe bide sehkîrin.

**-Sinan Sonkurt** (Serokê DEP'ê Siwêregê):

Ez naxwazim ku, DEP ji parlementoyê veqete, jîxwe dewlet ji dixwaze ku me ji qada siyasetê dûr bixe.

**-Musa Kulu** (Serokê DEP'ê Mêrsînê):

Ez vekişîna mebûsan ji meclîse rast nabînim.

**-Setar Yaman** (Rêvebirê DEP'ê Tarsusê):

Îro mebûsên me tên kuş-tin, serokê partiya me tê girtin, ji ber vê ji, tu rûmeta ma-yîna di meclîse de nîn e.

**-Abdülselam Uğurlu** (Endamekî DEP'ê):

Bila mebûsên me ji meclîse venekişin, bi greveke dirêj dengê xwe bigîhînin cî-hanê.

**-Mevlüt İlîk** (Serokê DEP'ê Dîlok-Entab'ê):

Divê em ji bo berjewen-diyyen gelê Kurd amadeka-riyên hilbijartînê bikin. Ger dewlet rê nede, em ji qada legal bi giştî vekişin.

**-Müslüm Kurucu** (Serokê DEP'ê Edenê):

Divê mebûsên me ji bo bi-karanîna riyen qanûnî heta dawiyî li ber xwe bidin.

**-Mahmut Doymaz** (Endamê Rêveberiya DEP'ê Os-maniyê):

Divê DEP ji parlementoyê veqete.

### DÎTINÊ NÛNERÊN SAZYÊN DEMOKRATİK

**-Ali Elçi** (Jimêrmendê Lîman-İş'ê):

Biryara herî baş, ji meclîse vekişin e. Lî ji bo vê yekê hê zû ye. Bila li Ewrûpayê têkevin greva birçîbûnê.

**-Erkan Çataloğlu** (Serokê Tüm Maliye-Sen'ê ya Mêrsînê):

Bila meclîse protesto bikin û jê vekişin.

**-Ramazan Ateş** (Serokê Eğit-Sen'ê ya Mêrsînê):

Divê li ser hemû rîgan (al-ternatif) bifiskirin.

**-Beytullah Soylu** (Nûnerê Herêmî yê DîSK Pet-kîm-İş'ê):

Parlementoyê hemû rî û şopên xwe winda kirine. Ji ber vê yekê ji, istîfakirina mebûsên DEP'ê girîng e.

**-Remzi Çalışkan** (Sekreterê Şûbeya Karê Rihayê):

Di vê rewşê de, xebata di parlementoyê de pîr dijwar e, lê pêwist e. Divê DEP bîngîhî têkoşîna demokrasiyê deyne.

**-Nûnerê Eğit-Sen'a Rihayê:**

Em dixwazin DEP têkoşîna xwe di parlementoyê de bidomîne û ji bo demokrasiyê bixe-bite.

**-Nûnerê Tüm Sağlik-Sen'a Rihayê:**

Tu wateyek ji bo mayîna DEP'ê di parlementoyê de nemaye. Bila istîfa bikin.

## Gelê Şîrnexê bêqût e

**Navenda Nûçeyan-** Li Şîrnexê ablûqeya (ambargo) dewletê ya li ser qût didome. Waliyê Şîrnexê, par li ser navçeya Elkê (Bêşebabê) û gundêna hawîrdorê wê ambargo dârbû. Îsal ji meh û nîvek e li navçeya Qilaban (Uludere) û gundêna li ser navçeyê, ambargo dârbûne. Li gorî çavkaniyê herêmi, 50 hezar insan di bin talûkeya birîbûnê de ne.

Hêzên dewletê par operasyonên dorfîreh li Şîrnexê pêk anîbûn. Gelê bajêr ji koçber bûbû. Ji sala par ve êrîşen dewletê bi taybeti li ser Şîrnex û hawîrdorê wê pêk tê. Waliyê Şîrnexê bi hinceta têkiliyên PKK'ê û gel li Elkê û gundêna wê ambargo ûlan kir. Ev ambargo saleke didome. Li herêmîn derdorê Şîrnexê talûkeya birîbûnê xwe daye der. Ev meh û nîvek e. Qeymeqamê Qilabanê, li navçeyê û gundêna wê ambargo dîmesine.

Li gorî şertîn ambargoyle, li Qilaban fabriqeya nan, serê malbatê mehî torbeyekî ard belav dike. Serokê Belediya Qilabanê Ömer Haçoğlu der barê ambargoyle de wiha axivî: "Ji demeke dirêj ve ye ku, ambargo li van herêman tê meşandin. Hemû xwarin û pêdiviyê me bi belgeyan tê standin. Ji bo vê ji destûra qeymeqam lazîm e. Ew gundêna ku cerdevanê wan nîn in, talûkeya birîbûnê xwe lê daye der".

# PÊNÛS



Amed Tigris

## Butçeya veşartî

**B**i salan in ku li Tirkiyeyê û Kurdistanê rôexistina kontrgerîla tê munaqesekirin, "Gelo rôexistina kontrgerîla heye, an na?" Rêxistinê Kurdistan û hinek çepen Tîrkan digotin: "Kontra heye û ew bi xwe di nav hêzên hikûmet û dewletê de ye." Hemû hikûmetênu ku hatin û cûn û ya niha jî di nav de digotin û dibêjîn: "Kontrgerîla tune ye. Li Tirkiyeyê demokrasî heye û her tişt vekir û zelal e. Ev idîaya parvekar û terorîstan e..."

Di diziya Waliyê Stenbolê Hayrî Kozakçioğlu de Serokomarê Tirkiyeyê Süleyman Demîrel mecbûr ma û mudaxele kir. S. Demîrel ji bo ku Kozakçioğlu paqîj derxe, wî ji diziye rizgar bike û skandalê bigire mecbûr ma axivî. Di bingehê xwe de S. Demîrel li medayê gef û gur xwar. Tîrs li wan afirand. Bi van gef û gurên S. Demîrel re rôexistina kontrgerîla eşkere bû. S. Demîrel wiha dibêje:

"Ev pereyê ku Walî Hayrî Kozakçioğlu ji Diyarbekirê a-niye û li Stenbolê di bankayan de razandiye an jî mesref kiriye ne yê diziye ye. Butçeyeke me ya veşartî heye. Ev butçe di destê serokwezîr de ye. Ji derî serokwezîr yek pê nizane. Pereyên vê butçeyê jî di xizmeta waliyê super (esta wî waliyê kolonyalîst e ku li Diyarbekirê ye) de ye. Erk û berpirsiyârîn walî heye ku butçeyê bikar bîne. Ne parlemento û ne jî Dadgeha Qanûnê Bingehîn nikare der heqê butçeyê de hesab ji serokwezîr û walî bipirse. Ji ber vê yekê divê medya dev ji walî Kozakçioğlu berde. Ez berpirsiyare vê yekê me..."

**Serokkomar bi devê xwe i-tîraf kir. Xwedî û cihê butçeya kontrgerîla serokwezaret e. Butçeya bi taybetî di nav butçeya serokwezîr de beşek e. Bi diziye. Ne parlemento û ne jî dadgeh nikarin mudaxele bikin. Rajname û TV jî nikarin behsa vê yekê bikin. Hesabê vê butçeya hanê bipirsin. Ev diyar dike ku li Tirkiyeyê kî bibe serokwezîr, direkt dibe berbirsiyare herî mezin ê rôexistina kontrgerîla.**

Di nav Kurdistan de gotinek heye ku dibêjîn: "Devê şeytan di salê de carekê li heqiyê digere." Lî devê Demîrel di 30 salan de carekê be jî, li heqiyê nagere. Lî di 30 salan de carekê i-tîraf dike. An jî dema dikeve tengasiyeke mezin hinek gotin ji devê wî disiqitîn. Ev gotina butçeyê jî wiha ji devê wî şiqitî, an jî şimiî. Lî, dîsa wekî ku devê wî bisewite.

Edî ji bûyera kontrgerîla re şirove û dokument ne pêwist in. Serokkomar bi devê xwe i-tîraf kir. Xwedî û cihê butçeya kontrgerîla serokwezaret e. Butçeya bi taybetî di nav butçeya serokwezîr de beşek e. Bi diziye. Ne parlemento û ne jî dadgeh nikarin mudaxele bikin. Rajname û TV jî nikarin behsa vê yekê bikin. Hesabê vê butçeya hanê bipirsin. Ev diyar dike ku li Tirkiyeyê kî bibe serokwezîr, direkt dibe berbirsiyare herî mezin ê rôexistina kontrgerîla. Her wiha bi vê yekê re S. Demîrel hem butçe û hem jî berpirsiyaren kontrgerîla yek eşkere kir. Ew jî serokwezîr bi xwe ye. Yê din jî bi xwe derdikevin holê. Ew serokkomar û serokleşkerên Tirkiyeyê ne.

Ew rojname û kanalên TV'ye yên ku diziya Walî Kozakçioğlu derxistin holê, li ser gef û gurên S. Demîrel sukût bûn. Dengen xwe bîrrîn. Dîtin ku darê zorê heye. Ordî di nav kar de ye. Kontrgerîla bi xwe ji aliyê serokhikûmet û serokdewletê ve têne idarekirin. Medya Tîrk bi gotina Demîrel, xwe weke butçeya xwe ya veşartî veşartîn. Weke ku ew nebêjîn û nenivîsin. Xwe telandin. Ji xwe bi salan in ku, demokrasiya medyaya Tîrk û ronakbîrên Tîrk bi icaze ne. Ew jî derî derew û fortan nikarin tiştîkî bibêjîn û binivîsin. Bêyî icazeta sêalî nikarin fîkrîn xwe bibêjîn û binivîsin. Ew divê ji serokwezîr, serokkomar û serokleşker icazetê bigirin. Borîzanê dewletê ne. Azadî û demokrasiya wan di destê van hersê dem û dezgehan de ne. Tîrpêr wan borîzaniya Kenan Evren dikirin. Pêr ya Turgut Özal, par ya Süleyman Demîrel û iro jî ya Tansu Çiller dikin. Hem jî li ser navê azadî û demokrasiye. Li ser navê mirovîn modern û Ewrûpi. Li Tirkiyeyê jî derî du tiştan her tişt dîbin. Ew jî silametî û demokrasî ne. Ev li ba wan tu carî nebûye û nabe jî. Heta ku siyasetvan û ronakbîrên wan ev bin!

# Kurdzan Dr. Rûdenko

## û Evdalê Zeynikê

**D**r. Rûdenko li ser ziman û wêjeya Kurdî gelek xebatêna hêja çekirine. Di nav wan de ya herî bi nav û deng xebata wê ya li ser Feqiyê Teyran e. Berhemâ Feqiyê Teyran a bi navê Şêx Senan bi xebata wê derkete holê.

### Seid Hesta

Ez wiha difikirim, Kurd ji aliyê hebûna çandî û wêjeyî ve parake mezin deyndarê dengbêj û çirokbêjîn xwe ne.

Divê em vê ji tu car ji bîr nekin ku, bapîrên me gelek tiştîn hêja nîvisandine û ji me re hiştine. Lî sed heyf û mixabin, dijminan nehişt em wan bixwînin. Erê xwendin û nîvisandina gelê me çiqas kêm be jî, dengbêj û çirokbêjîn mîna Çiyayê Agirî serbilind, bi zargotineke dewlemend, ev valahiyê dagirtine û bi vî awayî jî çand û wêjeya me li ser piya rawestiyaye.

Zimanزان, dîrokzan û wêjezana Sovyetî Dr. Marga-rîta Borîsowa Rûdenko di navbera salên 1950-55'an de bi dewlemendiya çand û wêjeya Kurdistan dihese, digere bi çavên xwe dibîne. Dema vegere wiha dibêje: "Li Rojhilata Navîn gelek, neteweyek heye, ew bi stran û kilamên xwe hem dilanan (dawetan) li dar dixin, hem ji şînê dîkin." Wê hengê hemû pispor li çavên hev dinêrin, bawer nakin ku, Rûdenko qala Kurdistan dike, ciwarêwan nîşan dide".

Dema li Muzeya Lenîngradê hinek berhemên Meleyê Cizîrî, Feqiyê Teyran û helbestriste bi nav û deng Ehmedê Xanî bi dest dixe, ji bo baş fêrbûna Kurdi tê, li nav gundiyan Kurdistan li Ermenîstanê demekê dimîne. Pişti te-kûzkirina Kurdiya xwe diçe lê hûr dibe. Dr. Rûdenko li ser ziman û wêjeya Kurdi gelek xebatêna hêja kirine. Di nav wan de ya herî bi nav û deng xebata wê ya li ser Feqiyê Teyran e. Berhemâ Feqiyê Teyran a bi navê Şêx Senan bi xebata wê derdikeve holê. Ev canika hanê di gel hemî pisporiya xwe, bêyî alikariya Qanadê Kurdo ev xebat nake.

Her çiqas ev nav ji bo gelê Kurd ne biyanî be jî, ez bi çend peyvan dixwazim qala wî bikim. Qanadê Kurdo, ji Kurdên Ermenîstanê ye. Ji a-liyê çand, wêje û dîrokê ve pisporekî mezin e.

Dr. Rûdenko li ser kilam û stranên Kurdistan jî xwediyê zanabûneke fireh e. Radyoya Kurdi ya Ermenîstanê der-heqê wê de wiha digot: "Li Polonyayê li ser çand û wêjeya gelên Rojhilata Navîn ci-

**D**r. M.B. Rûdenko di navbera salên 1950-55'an de bi dewlemendiya çand û wêjeya Kurdistan dihese, digere bi çavên xwe dibîne. Dema vegere wiha dibêje: "li Rojhilata Navîn ci gencîneyek sergirtî heye ev çand û wêjeya Kurdistan."

Keçê dînê xwezila min tu têxista ber mala giranê.

Gulê wayê Gulê wayê lê Gulê çavê te ji min re reşbeklek in.

Bejna te tayê rihanê, ji min re bi qayde ye.

Dîwana Sûrmeli Mehmed Paşa cihê mîr û hekim e.

Ez cûme mîvaniya mala bavê Gula xwe Gulê canê Tarihana serê ciyanê, Silêvarka devê Gola Wanê.

Xwezila wez bibûma malxwey, tu bibûya bermalî. W'ezê bême mala bavê te xas mexmer e.

Ji min re çêke birincê ci-yayê Qilincê, Cot çiçikên xwe biavêje ser e.

Gulê canê Gulê tarihana dev gelîyanê, silêvarka Gola Wanê.

Gulê bi rik lê vedigerîne:

"Evdal mala te şewitiyo di-de me xweş dide me,

Çavê min reşbeklek in, bejna min ji te re tarihana devê çem e.

Devê min hubir e, zimanê min ji te re qelem e.

Kuro dîno, li gor perdeya devê xwe pipeyive,

Wez pîrek im, tu zilamî, nabe ez bibêjim;

Ez bergêdanî heftê bavê te me, hîn zêde me."

Bi vî awayî çend roj diborîn, yek nikare zora yê din bibe. Pişti çend rojan Gulê tê dîwana Mîr. Evdal û Gulê dest bi hevceribandinê dîkin.

Evdal: "Gulê canê Gulê canê şemaoka bostanê.

## Çinara bilind

**Çinara azadiyê, xemxwarê êşen gelê xwe û hemû mirovahiyê, avakarê Enstituya me, evîndarê xaka xwe û şehîdê Kurdistanê MUSA ANTER emê te ji bîr nekin û pênuşa te li erdê nehêlin.**



**Kargeriya Enstituya Kurdi ya Stenbolê**

# Gelê Başûr NÇM hembêz kir



NÇM'ê bala jinêni ji başûr ji dikişand ser çalakiyên xwe



Koma Mezopotamya ya NÇM'ê ya Hewlêrê ji beşdarî şahiyan dibû

**Avesta**

**Welat/Hewlêr-** Tûmeya Navenda Çandê ya Mezopotamayê (NÇM) di 16'ê İlônê de li Zaxoyê bi kêt û şahiyeke mezin ve qediya. Tûme di 28'ê Tebaxê de dîsa li Zaxoyê dest pê kiribû. Di çalakiyên NÇM'ê de gelê Başûr pêwendî û kêteke mezin şanî endamên NÇM'ê dan.

Navenda Çandê ya Mezopotamayê li ser protokola ku di nav wan û Hikûmeta Federal a Başûr de hatibû çekirin, ji aliye hikûmetê ve hatibûn vexwandin. Qefileyâ NÇM'ê li 14 cihêن Başûr pêşande (hefle) yan çekirin. Qafileyâ NÇM'ê ji Koma Çiya, Koma Amed, Ganî Nar, Şanoya Jiyana Nû û ji Koma Serhildan a Govendê pêk dihat. Her wiha di çalakiyên NÇM'ê de endamên NÇM'ê ya Hewlêrê ji cihêن xwe standin.

Pêşandeyên NÇM'ê ya Stanbolê li bajar û navçeyen Hewlêr, Silêmaniye, Helepçe, Kifri, Çemçemal, Ranya, Koysincaq, Şeqlawâ, Rewandiz, Amadiye, Dihok, Zaxo û hwd. li dar ketin. Di pêşandeyan de bala gelê Başûr bêhtir govend û şano dikişand.

Car caran di şahiyan de ji 56 hezarî bêhtir gel beşdar dibû û bi coşeke mezin, bi mirûzeke bilind gel xwe di pêşandeyan de dida nîşan.

**EM ENIYA ÇANDÊ NE**

Piştî qedîna çalakiyên NÇM'ê me li ser armanca pêkanîna van çalakiyan bi Berpirsiyarê Qafileyê û ya NÇM'ê Filiz Oğuz re hevpeyvînek kir. Pirsên me bersivand. Oğuz armanca pêkanîna çalakiyan wiha vedigot: "Têkoşîna ku li bakurê Kurdistanê bi pêş ve dice, em ji tê de wek eniya çandê cihê xwe digirin. Armanca me ew e ku em li her parçeyen Kurdis-

tanê şax û liqên NÇM'ê vekin, rewşenbîr, humermend û nivîskaran ber bi hev bînin, çanda Kurdî navendî bikin. Di vê çarçoveyê de me li Hewlêrê şaxekî Navenda Çandê ya Mezopotamayê vekir. Em dixwazin bi van çalakiyên xwe yên çandî hem pêşîya şaxa Hewlêrê vekin û hem ji têkoşîna bakurê Kurdistanê bi gelê me yî Başûr binâna".

Ji Berpirsiyarê NÇM'ê Fî-

xwe. Lê ji ber ku tu hêviyeke xurt nedane gel, bêhêvîbûnek li ser gel peyda bûye. Gel ji pêşeroja xwe ne bawer e. Ji aliye teşeyî (şekli) ve her çiqas taybetiyan Kurdî li ser xwe bide nîşan jî, li ser kesaniya wan bandora Ereban tê dîtin. Bili vê bandor û hîkariya avahiyîn siyasi jî li ser wan heye. Hê ji bandora Sedam li ser gel heye, bi hikûmeta Federal re ji tu guherîn çenebûne. Di civaka Başûr de tıralî, bêhêvî-

Başûr ji balê dikişine ser bandora çanda Tirkî. Oğuz dibêje ku, ta niha li ser Başûr hîkari û bandora çanda Ereb, Fars hebû, niha jî ya û Tirkî peyde bûye. Li Başûr mûzîka erebeskî di rewacê de ye. Ev ji bi navgîna hunermendêne wek İbrahim Tatlıses û Emrah dibin ku bi koka xwe Kurd in, lê bi Tirkî distrîn. Oğuz li ser vê mijarê nîrîna xwe wia bîlêv dike: "Ev ne bi tenê bi destê hunermendan e, politikaya



Koma Çiya di şahiya Silêmaniye de

liz Oğuz dide xuyan ku ji ber hin kemasîyan pêşande wek dilên wan pêk nehatine. Lê disa di her keys û fersendê de bi gel re ketine têkiliyan, bersiv dane eleqeyen wan û Bakur bi wan dane nasîn.

Oğuz pîrsa me ya der barê têkoşîna Başûr de ji bersivand, daxuyand ku serê çendik û çend salan e li Başûr têkoşîn heye, gel bi mirina xwe beşdarî nav têkoşînê bûne lê, serok û pêşengên têkoşînê zêde hewl nedane xwe, her wiha daxwazîn gel ji nebersivandine. Oğuz wiha didomîne: "Li başûrê Kurdistanê gel bi hezaran rabûye ser

bûn, bêmirûzbûn xwe bi dayarî dide nîşan".

**'GEL BÊHÊVÎ YE'**

Filiz Oğuz li gorî ji me re vegot, ji bo armanca berhevanîna xebatê çandî, hunerî, ji bo her çar parçeyen welat nedîtine. Bêhtir xebat ji bo Başûr heye û gelşen aborî di ser hemû gelş û pirsgirêkan de dibînin. Berpirsiyarê NÇM'ê di de xuyan ku, her çiqas mijarîn aborî girîng bin ji divê li pêşîya xebatê çandî û hunerî nebe asteng û her wiha çi barê ku bikeve ser milê wan dê ew bînin cih.

Li ser talûkeya ji bo çanda

dewleta Tirk e ji. Nivîskar û hunermendêne ku çand û nîrînê Kurdî wek nirx û çanda Tirkî didin nîşan li Başûr pirr têz hezkirin. Hin mirovan ji me re vedigotin: "Em de peyker (heykel) ên Yaşar Kemal û Ezîz Nesîn li vir daçikîn". Ev tiştekî pirr ciðî ye. Divê li serê bê rawestin. Em dixwazin ji Başûr re diyar bikin ku ew kesen li wir têz hezkirin li Bakur tu rûmeteke wan li ba gelê Kurd nîn e". Di dawîya hevpeyvîna xwe de Oğuz dide diyarkirin ku ji vê tûrneyê gelel sîd û kelk girtine, bûne xwedî tecrûbe, hevdû naskirine û dê di pêşerojê de bernâ-

Zagros Agirxwîn, di dawîye de ji daxuyaniyê xwe wiha berdewam kir: "Ji bo yekitiya Çanda Kurdistanê divê her çar parce ji xebatê bikin. Ev erkîn xwe yên neteweyî bînin cih.

**LI BAŞÛR TESÎRA  
ÇANDA TIRKÎ**

Endamên Navenda Çanda Mezopotamayê ya şaxa Hewlêrê ji beşdarî çalakiyan bûbûn. Li ser vê tûrneyê me dîtin û nîrînê wan ji xwest. Serokê şaxa NÇM'ê ya Hewlêrê Zagros Agirxwîn pîrsên me bersivand. Agirxwîn li ser armanca NÇM'ê rawest, da diyarkirin ku parasîtin, hêvişandin û pêşvebirina çanda Kurdî armanca wan e, her wiha li Amedê (Diyarbekir), Edenê û li Hewlêrê Şaxen NÇM'ê ya li Stenbolê vebûne. Li ser avakirina şaxa Hewlêrê ji wiha got: "Çanda Bakur û Başûr ji hev dûr ketin, Hezên metingehkar di vê hêlê de bi ser ketinê. Armanca me ji holê rakirina astengen li pêşîya yekkirina çanda Kurdî ye. Çanda Başûr pirr dewlemend e, lê ketiye nav hewayeke dejenerasyonê. Li vê heremê êrişa çanda Ereb, Fars û Tirk heye. İbrahim Tatlıses, Derwiş, Feyrûz û Nasir Rezâzi bêhtir têz guhdarîkirin Em dixwazin cewhera ku di çanda me de heye derbixin û li diji çandâ dagirkerî li ber xwe bidin, têbikoşin".

Zagros Agirxwîn, di dawîye de ji daxuyaniyê xwe wiha berdewam kir: "Ji bo yekitiya Çanda Kurdistanê divê her çar parce ji xebatê bikin. Ev erkîn xwe yên neteweyî bînin cih.

# Frankfurt di Festîvalê Kurdan

J. Espar/ Frankfurt- Nêmey sew ra pey otobusey ma Kurdanê Swêdi Hamburg ra viyarti. Rayîri xalî û şew bêveng a. Zafîneya rayanê na şewa bêvengi Kurdi. Heme welatanê Ewrûpa ra cenî û camêrd, pîl û şinik hinzarân reyra Kurdê Ewrûpa rayan i. Rayanê azadî û serbestey. Bochum ra pey emsar zî Kurdi benî mîmanê Frankfurtî. Do Frankfurt di zî veynî "Wa biciwiya Kurdistan!"

Otobusanê Kurdan tê dimi nabi. Otobusê xemelnayey to vatinî veynî estorê veysikan i. Şonî veyek hewlenenî. Namey veyeki Kurdistan a. Şarê festivali eynî sey şardê veiyî cilê xwinê wedartey, cilê xwinê roşanî pira girewtibî. Ewro roşan bi, roşanê Kurdan. Nizdî Walstadiyon, parka otobusan di çend sey otobusî rîz bîbi. Ne vernî yînî asaynî ne zî peynî. Soforê mawo Swedij: vano "Mi heytê xwi di ehendey otobusî filiman di zî nediyî."

## PROGRAM DEST PÊ KENO

Şarê festivali, parka otobusan di dest bi govendi girewtisi keno. Xortî xwi wenî. Ez vaja des, şima vajê vîst komanê govendi ay cay xwi ro daynî. Vengê dayîran yînî tê ro pêşaynî û tililiyan asmîne Frankfurî seqnaynî.

Seet des û nêm ra pey şar hêdî hêdî ver bi berandê stadyum ra şenî. Kesî her bi eştimî nêkewtinî ard. Hema ca mîrdimî, mîrdimî û hewna mîrdimî... Tarîxê Kurdan di, Ewrûpa di ehendey Kurdi yew stadyum di caran nêameyî têhet. Yew ceniya Soran ewniyay milleti ra û mi ra persay, vat: "Nika ehendey Kurdi biramî Estembul ser nişnî Estembul çend seestan di zeft bîki?" Raştey cê mi nêzana ez ti ra se vajo, la belê yew ci eşkera bi; ehendey mîrdimî eke biwazî se vajî kenî.

Festivalê Frankfurî heme hewayan ra cemâtê Kurdan temsîl kerdinî. Hetî ra kesşeno vajo no festival mînyaturê cemâtê Kurdan bi. Festival di heme hîrê lehçey Kurdkî (Zazakî, Kurmançî, Sorankî) qisey bîni. Festival di Kurdele elewi, sunî, êzidî û ateist pîrû piya bî. Her çiqas ki zafîneya şardê festivali Kurdele Vakurî bi zî la belê heme cayanê Kurdistani râ Kurdi ameybî festival. Şima Dihokijan, Hewlêrijan vanî, şima Afrînijan, Mahabatijan vanî, kam cinêbi ki! Heta bînî ra zafîney partî û organîzasyonê Kurdan bi çend tehan reyra zî bîbo, ameybî festival. Cora zî no festival yew platformo Kurdano millî

bi.

Semedo ki zaf sexlet bi, programî di seetî berey dest pê kerd. Programê festivali bi orkestraya Koma Berxwe-dan dest pê kerd û bi grubanê folklorê Kurdan, Tamîlan, Keldaniyan, Yewnaniyan û bi grubanê muzîkî ey Afriqa, Kuba dewam kerd. Dengbêjey sey Ferhat Tunç û Beser Şahîn zî program di bî.

## MÎMANÊ NAMEDARI Û MESAJÊ SEREK-WEZIRAN

Programê kulturî ra şarî festivali lomey kerdinî. Çimkî nîzdî se hinzarî mîrdim amebi pêser. Program gore bê ne festivali nêbî. Cido xam çinê bi. Diyalogê dengbêjan û komanê muzîkî şarî reyra gelek tanî bi. Şarê festivali

no ki Kurdan waredê diplomasî di zî gelek menzîl gi-rewto. Kes hêvî keno ki Kurd û Dîna do hêdî hêdî yewbînan fahm bikî.

Prof. huquqî Goran Buns-dorff (Serekê Federasyonê Aştiya Finlanda), zaf weş qisey kerd. Ú waşt ki, Ewrûpâ-yîji bikewî mabênen dawleta Tirkan û PKK'ê. Yê bi xwi zî waştinî ki, heze pêadox na mesela ser o bixebeto.

Senatorê Belçika Hugo Rompaey, qisekerdişê xwi di vatinî "Generalê Tirkan ganî qetilkerdişê Kurdan ra fek veredî. Kurdi teroris niy i. Hetanî peyniya na seserri ganî Kurdi azad bî. Ez hetanî peynî no leji di şima reyra ya. "Parlementera İsvîcre Angelina Frankhauser zî, qisekerdişê xwi di zilm û zordareyda Tirkan ser o derg û

fahm nebîbî. Lord Avebury (Parlementerê Ingîlîstanî) dest bi qisan kerd û behsê şehîd biyâşê Mehmet Sîncarî kerd. Na mesela ra pey heway festivalê vuriya. Millet sloganan rî sur bî. Adir fîkdî yînî ra varaynî. Spikeri sloganî vatînî û şarî vê dim a vatînî: "Biciwi Serok Apo."

## PRESS KONFERANS

Mesajê ersawitoxê festivali zî, şardê festivali rî xumî bî. La belê ana asaynî keyfî şarî ameynî. Persa Kurdan zî hinî bînî persa paytextanê Ewrûpa. Helmut Kohl (Serekwe-zîrê Almanya), Richard Weiszackeri (Serekdewletê Almanya), Juan Carlosi (Qralê İspanya), Carl Bildi (Serekwe-zîrê Swed), A. Huber (Serekê Parlamentoya İsvîcre) û sewbî gelek serekweziranê e-

festîval di qisey kerdibi, pêru norûdorey mesule ERNK di der heqdê pirsa Kurdan di fîkrî xwi vat û cewabê per-sanê rojnamevan da. Yew rojnamevan mesulê ERNK'ê ra persa, vat:

Yew heti ra Kurdistan di lej esto, heta bîni ra şima ti-ya festîvalan virazenî; go-vend gînî, deyîran kenî nê kontrastî ti senêhewa izeh kenî?

Mesulê ERNK'ê vat:

La şima vanî ma roşî, bi-bermi? No festîval zî yew parçey lejî yo. Şarê me ser-hildanan di govend gîno. Ma mecbur i, merg û heyati pê reyra bifikirî.

Yewna rojnamevanê Al-maniy ay mesulê ERNK'ê persa: Ana aseno persa Filis-tinjan di Amerika însiyatîf girewt û mesela yînî hel kerd. Mesaladey Kurdan di kam dewleti şena yew însiya-tîfo anasarân bigêra, mesela Almanya senê na?

Mesulê ERNK'ê vat:

Ma bawer kenî ki meselây Kurdan ganî Kurd bi xwi hal bikî. Hetanî ewro yew devlet zî meseladey Kurdan ser o ci nekerdo. Devletêka ana-sarân zî ewro nîasena. Meseladey Almanya ser o kes şeno tayna çiyan vajo. Al-manya hetanî ewro ver a Kurdan destey Tirkiya biya. Çekê ki Kurdi pey kişenî, za-fineya yînî çekê Almanya bi xwi yî. Ebi no hewa Almanya sucdar a.

Heta bîni ra Almanya se-medo ki, ma nê festîvali nîvirazî ci dest ra amewo kerd û nika zî, şima ra aseno hinzarân reyra polîs û eske-ranê Almanya dormarey ma girewto.

Eke nê tedbîri semedê pa-witiş û emniyetê ma bibînî ma ka yînî rî sipas bikî. La belê şima ra, aseno ki mîmananê ma rehet nîvar-danî. Sînorê xwi pîrû padayî ki, Kurde welatperwerî nîri festival.

Muxabîranê Tirkan hetanî peynî press konferans goşta-rit û warîşti sî. Do hewna zu-ran û negan bikî Kurdan.

Mesajê Serekê PKK'ê Abdullah Öcalanî peynîda festî-vali di ame. Şarê festivali mesajê Öcalanî vengdê yê ra goştarit.

Festival nîmey şewi ra pey bi rispêney qedîya. Şarî hînî Frankfurt ra xatir waştî-nî. Frankfurt di zî yew derbi dayîbî dewleta Tirkan ro. Aw semed ra keyfî yînî ca di bi.

Kam ci zano beno ki, ma festîvalê hîrîni pîrû tê reyra Diyarbekir di virazenî. Ayê ki mi zaf xeyalperest veynenî wa biney bifikirî! Kamî pane serrî ra ver bawer kerdinî ki, se hinzar Kurd Frankfurt di yeno têhet.



Şarê ma rayna Festivalê Frankfurî di yeño wêynayîş

sîma çendi vajî ehendey ges bi. La belê ne koroy û ne zî dengbêjî gore bê zerriba yînî nêbî. Nîşaynî xîtabê yînî bikî. Helbet no ware di rolê xîs-neyyda stadyumî zî bi. Tema-sekerdozan sehne weş nedînî. Caxo ki programî dest pê kerd, stadyum di tanî cayê vengî asaynî. Hetanî peynî zî nê cay ge ge pir bî, ge ge zî nêbî. Çimkî da-vîst hinzar ten timi teber ra bi. Qorî şînî, qorî amaynî, turîbînî sey quâ mijloran timi bi hereket bi.

İngîlîstan ra, Belçika ra, İsvîcre ra, Finlanda ra, Yewnâstan ra û gelek welatên bînan ra parlamenteri, senatorî, profesori ameybî Frank-furt. Mîmanê festivali name-dar bî. Nê mîmanan ra fahm bînî dostê Kurdanê er-jiyayey estî. Hewna ana ase-

dila vindertî. Tira pey zî waşt ki, dewleta Tirkan PKK reyra roşa û dewa Kurdan safi bika. Medico Internasyonal ra Hans Branscheidt, Parlementera Yewnâstan Eliza-beth Papazoî, Profesorê U-nîversîta Essexê Kevin Boyle zî festival di, der heqdê me-sela Kurdan di fîkrê xwi vat û paşt day lejê Kurdan.


## XEBEREY ŞEHİD BIYÂYİŞE MEHMET SÎNCARİ YENA

Spikerê festivali wexto ki, na xebera nîweşî anons kerd bermi qirikda yê ro pêşa û nîşa peyniya qisandê xwi biyaro. Şarê festivali dest bi sloganan kerd: "Piro-di gerîla pirodi, Kurdistan vi-razı!" Na sloganî yew deme vajîyay û tira pey sloganê bî-nî amey. La belê mesela rind

yaletanê Almanya mesaj er-şawitibi. Çaxo ki namey nî-nan waniya gelek kes şâş mend. Yew hetî ra Almanya semedo no festival nîviraziyo gurey gureyenî kerdî, he-ta bîni ra mesajan erşawena. Têlikî diplomasî neqşenî i.

Partî û organîzasyonanê Kurdistana Vakurî hemînî mesajî erşawiti bî. Nê mesajan ra tena mesajê Serekdê PSK'ê Kemal Burkay wani-yâ.

Der heqdê festivali di mesulê ERNK'ê yew press konferans viraşt. Çend hebî televîzyonê Almanya, rojnamey Tirkan, Kurdan û ey Awru-payjan ameybî press konfere-ansi, Komitay festivali se-mendo ki rojnamevanî rihet bixebeti heme cî hadire kerdi. Faks û telefonî weş xebetaynî. Mîmanamê ki



# Ji evîndarê re name!

## Seyît Çiya

...ez jî wek te, teyreke bêbirîn û bêhêlin... wek deryayeke bêkelek... bêxwedî û wek êvareke bêşefeq bûma.

Xewen min bêkabûs... dilê min bêkeser bûya

Ez sebiyekî sêwî, evîndarekî bêfedî, laşekî bêmejî, serxweşekî serserî û qewmekî bêserî bûm.

Emrê min bi sedan sal, dilê min wek çiyayekî kal bû.

... di zîndanan de, sebra min wek çoleke beyar, di laboratuwarên zilmê de hişê min bêneyar bû.

Her wekî ku tu jî zanî... hêrsa min... bahozeke payîzî, germeke havînî û alaveke bêşewq bû.

Dilê min car caran wek Birahîmê Heskê Grîdaxî, car caran jî wek Seyîd Rizoyê Münzurî, wek Besêya ji Eşîra Qoçgirî, car caran wek keça Aşûrî, Margireta Behdînî bû. Ez gul, ez jî bilbil bûm.

Sofiyekî bêhiş, şêxekî bêdergeh, feqiyeke bêqible bûm. Teyrekî baskikandî û şerekî birîndar bûm.

Di şikeftên çiyan, bin kevirên çolan de, li ber siya pelan dîwaneyek bûm.

Di pirtûka Xanî de Mem, di ya Fizûlî de Mecnûn bûm. Navê min di nav hinek qewman de Spartakûs, di nav hinekan de jî Ferhad bû.

... qêrînek bêdeng, lalekî bêferheng bû(m)...

Ne 'felsefe', ne 'îdeoloji'... ji derdê min re ne derman bûn!

Kulîka Tebaxê, wek gulleya ewil... wek zelzeleya dîrokê... mayînên mejiyan, aşê birçîyan, ava tiyan... kula sedsalan...

Evîna veşartî... Axa bi xwîn şûşti... Xewnêş sevan... Xeyalêñ koleyan...

Min te nas nekiribû. Navê te nizanibû, bêhna te, keziyên te nedîtibû...

Lê, di çîrok û kilam, keser û destanan de, te bihîstibû. Qala te dikirin pîr û kalan...

Bêdîtin, bêxeberdan, bêbêhnkirina... zana û mezinan...

Min ji te hez dikir bi evîneke îlahî...

Sal û qîrn derbas bûn... Roj û şev geriyan, hêvi bû berf û baran li asîman. Bextê reş vegeriya... Civat rûniştin li ser peymanan, qeyda dil û mejiyan şikiya.


Xezal, tu..? Bejna te awirêne te..? Wek tîrekê, wek gulleyeke serserî... Wek deryayeke bêbinî... Helbestek bêserî...

Lê çavêne te..? Çavêne te..? Wek qendîl... Ne qendila şevan... ên tixûban. Tixûbêñ şaristaniyan. Wek çiyayêñ Kurdistan, xeta dilê mirovan, vejetandina destê gelan, dûrbûna roj û şevan, ferqa tarî û ronahiyan... kesera feqîrîn evîndaran.

Li ber wan... wek sêwiyeke belengaz, ez... wek derwêşekî bêsaz, evîndarekî bênaz.

Min çok şikand li ber te... Bi lava... lê bi rûmet; 'têm çavêne te... çavêne te...'

## DR. ZEKÎ TANRIKULU



Neyarêñ xwînfir sterekî din jî xuricandin.  
Lê bila bê zanîn ku, ew tava germ in ji  
tovê hêviyê re.

Li ser navêñ welatparêzêñ Farqinê

Zana Farqînî

## AZADÎ

Abdurrahman Durre



### Zeyneba Zer

Mele diçe ïznê, ji gundiyêñ xwe re dibêje: "Bila yekî dengxweş û rind li pêşıya we nimêj bike, heta ez jî ïznê vedigerim." Pişti ku mele ji gund diçe, gundî li hev dicivin ku rindekî dengxweş li pêşıyan wan imamtî bike. Ji bilî Zeyneba Zer kesekî dengxweş û rind nabînim, bi mecbûrî wê dixin imam û li dû wê nimêj dikin heta ku imamê wan ji ïznê dizivire. Îmam ji wan re dibêje: "Kî li pêşıya we nimêj kir?" Dibêjin: "Zeyneba Zer." Mele dibêje: "Hey Xwedê mala we xerab bike, we ci kiriye? Li pey jinan nimêj nabe." Civat dibêje: "Seyda di gund de ji Zeynebê rindtir û dengxweştir tune bû, te jî gotibû gere imam dengxweş û rind be. Me ci zanibû ku li pey jinan nimêja mîran nabe?" Li ser wê gotinê, yekî xort ji civatê re dibêje: "Bi Xwedê ez ketim ferqê ku nimêja me betal bû, dema ku Zeyneba Zer xwe pilûç dikir, têrmaşê min xwe mûç dikir, dema ku berjêr diçû ew hevraz dibû..."

**Ji Zeyneba Zer ku  
behs vebûye, gotine-  
ke pêşıyan jî der  
heqê wê de heye. Bi  
vê munasebetê em vê  
gotine jî, ji xwend-  
vanêñ hêja re pêşkêş  
bikin. Wiha ye :  
"Zeyneba Zer xwe  
da, kate jî li ser."  
Gotineke din jî xweş  
heye, dibêjin, "Zey-  
neba Zer, geh li bine,  
geh li se**

Dema... Min ji wê  
fêm kir ku ew ne  
tu nimêj bû..."

Demîrel ji, de-  
ma ku ji serok-  
wezîtiyê çû, li ci-  
vata xwe tewsiye  
kir ku, yekî deng-  
xweş û rind bînin  
şûna wî, civata  
hêja jî wesiyeta i-  
mamê emekdar  
û zana pêk anîn  
û Zeyneba Zer  
(Tansû Çîller) ji  
imamtiya xwe re  
hilbijartin û kirin  
serokwezîra

xwe...

Gerçi hinek xortan gotin, "Nimêja me li pey wê na-  
be.." Lê Kalê Şareza Serdodikê Lawê Paşê (Erdal  
Înönü) fetwa da û got: "Ji wê çêtir û rindtir tune ye,  
bavê min ê rehmetî jî li pey jinan nimêj dikir, mez-  
hebê me laqtî ye. Nimêja me li pey jinan jî dibe li  
pey guran jî..." Li ser wê fetwa hemdemî Zeyneba  
Zer (Tansû Xanim) bû imam û dest bi nimêja xwe ya  
faşistî kir. Gerçi heta niha tu nimêjeke pak û durist  
nekiriye, ji vir wiha jî nake, lê di nav civata Demîrel  
de ya dengxweş û rind hê jî ew e. Nimêja kê jî, wek  
a Ebûlfeyz Elçîbeg betal dibe, bila bibe. Xema wê  
nîn e. "Tirkek bedêlê dînyayê ye" Ji Zeyneba Zer ku  
behs vebûye, gotineke pêşıyan jî der heqê wê de  
heye. Bi vê munasebetê em vê gotine jî, ji xwend-  
vanêñ hêja re pêşkêş bikin. Wiha ye : "Zeyneba Zer  
xwe da, kate jî li ser." Gotineke din jî xweş heye,  
dibêjin, "Zeyneba Zer, geh li bine, geh li ser"

Em jî dikarin wiha bibêjin ku, "Şer şer e, ci jin e ci  
mîr e". Bi gora bavê "Elçîbeg" ku nimêja wî betal  
bûye... Nimêja Lawê Paşê betal nebe bes e! Na lo!  
herhal wê nimêja wî jî di nêzîk de betal bi be, belkî  
înşaellah di nêzîk de. Nimêja bi tevahî bête kirin.  
Yanê bimirin ku pêşîra xelkê ji wan bi tevahî xelas  
bibe..."

İmamekî adil û zana, civateke wek insanan bibe  
nesîbê me û hemû misilmanan.



# Seyê Xayîn

Li gundekî Tetwanê  
 Raserî gola Wanê  
  
 Hebû mirovek şanaz  
 Xwediye malên colên  
 pez  
  
 Dem bû havîn, germa  
 tûj  
 Li hawir giya bû pûş  
  
 Pîreka wî lê hilat  
 Got: "Ma ne çax e  
 Şêrzat?  
  
 Emê herin zozana  
 Lê pezê me bêdan e"  
  
 Roja din bi rojhilat  
 Bar kirin koç bi rê ket  
  
 Berê xwe dan heyînê  
 Zozanê Şerefînê  
  
 Piştî sê rojan gihan  
 Konê koçerî vedan  
  
 Pez berdane çêreyê  
 Nav nefel û nav giyê  
  
 Hebû sekî wan ï har  
 Pirr jêhatî bû Suwar  
  
 Geh pez birin çêreyê  
 geh dianîn bêriyê  
  
 Çend rojêñ wan qediyan  
 Gur bi wana hisiyan  
  
 Bi radorî pez ketin  
 Lê qet fersend nedîtin  
  
 Lewre se pirr şiyar e  
 Li dora pez digere  
  
 Gur wiha nesezinîn  
 Rabûn civînek danîn  
  
 Gotin: "Em çawa bikin?  
 Em bi se bi le bikin"  
  
 Gurekî pîr xwe da pêş  
 Got: "Wî nas dikim ji  
 mêt  
  
 Emê wî ji rê bibin  
 Riya xwe li pez vekin"  
  
 Gurekî din ket peyvê  
 Got: "Me jî wiha divê  
  
 Lê ka bi ci mûcîbî  
 Tê wîna ji rê bibî?"



Got: "Kar pê tune Xapandin karê min e"	Got: "Bibe yek bi me re Ji xwediye xwe biqere"	Kevir kevir, lat bi lat Nêrî gilokek hirî Li nava hinek strî
Gurê pîr û ixtiyar Kete radorî Suwar	Tiştê ji pez em bikin Emê bi hev re bixwin Tu bêje 'erê' û hew Tim bixwe goştê qelew"	Meyizî ci bibîne Ew der sor in ji xwîne
Got: "Ka bila were vir Wilo nebe dil kevir	Suwar çû ser tayê wan Bi hev re kirin peyman	Got: "Xuya dike rastî Mû heye li vî mastî"
Em û hûn em bira ne Lê çima em wiha ne	Suwar kete nava pez Sê mih neqandin bi lez	Çav avête hawîrdor Nêrî hinek axa sor
Wan mirovîn derewîn Em li hev kirin xayîn	Dûrî xistin ji kerî Gur hemû hatin alî	Ew axa nû kolayî Xwîn li dor rijiyayî
Em gewr in hûn belek in Lê bi eslê xwe em yek in	Her sê mih xeniqandin Ûr bi wan pîpikandin	Demâ dest avêt tevde Hestî tije di nav de
Ne bi roj û ne bi şev Çavêñ te naçin ser hev	Hestî kirin bin axê Bo Şêrzat pê dernexe	Ji xwe re got: "Ev gur in Evêñ ku ev mih xwarin
Ka bêje ew xwediye te Çi xwarinê dide te?	Rojek, dido, sisê, çar Kerî hindik kir Suwar	Her der bûne axepol Bi gevzek û bi pîkol
Ew tim dixwin goştê nerm Para te hestî û çerm"	Şêrzat bi pez hisiya Got: "Ev ci qewimiye?"	Lê Suwar di ku de bû ? Ma qey ew di xew de bû?
Suwar pê re beşî Hêdîka ber pê meşî	Her roj deh meşkên mezin Me bi şîr dadigirtin"	Kî bêje heye nîn e Suwar li me xayîn e"
Got: "Ma em ji ku zanîn Ku em û hûn bira nin	Piştî pez dane mexel Ew û jina xwe Xezal	Dîsa ew ax kire kom Bilez vegeeria kon
Va mirovan em û hûn Ji hev û du dûr kirin	Mih û bizin bijartin Ketin nav wan hejmartin	Got: "Ka Xezal derkeve Rewşa mihêñ me ev e
Edî bêjin bê çawa Bibim alîkarê we?"	Nêrîn deh mih kêm bûne Gelo bi ku ve çûne	Yek bi me nehiştine Her deh hemû kuştine"
Kêfa gur hat û kenî Ji eşqa dil dijenî	Derket gerê Şêrzat	Wê şevê rabû Şêrzat Li bin latekê veket

Çav gerand li ser û bin  
Bi balkêş û bêpêjin  
  
 Ber nîvê şevê nêrî  
Pez li hevdu zivirî  
  
 Suwar mihek raqeta  
Vekişand ber bi lata  
  
 Ji hêleke din du gur  
Hilperikîn ber bi wir  
  
 Seyê bêşerm û bêar  
Bi wan re bûye hevpar  
  
 Dengê tivinga Şêrzat  
Kir ku bêht bi wan de  
hat  
  
 Herdu gurên çavbirçî  
Dûv li xwe kirin qemçî  
  
 Suwar mat ma pernisî  
Bi erdê re melisî  
  
 Herdu guh mane çeqel  
Lerizî kete mexel  
  
 Şêrzat raser sekinî  
Peyivî bi gazinî  
  
 Got: "Tu çêlî bû  
Dema min tu anîbû  
  
 Bi şîr û goşt û bi nan  
Tu xwedî kirî her dan  
  
 Tu bûy nefsek ji malê  
Hevparê qûtê salê  
  
 Me bo te qencî dixwest  
Ji can û dil diparast  
  
 Em bûne bav û dayîk  
Tu ji me re bû lorîk  
  
 Edî bêje min Suwar  
Tu çawa bûye neyar  
  
 Kesê xayînê xwe be  
Wê rojekê wî hebe  
  
 Ey Suwarê malmîrat  
Edî va roja te hat"  
  
 Kêr dayê jêkir terrî  
Eyar kir çermê seri  
  
 Got: "Edî vê zanibe  
Kesê ku xayîn dibe  
  
 Xayîntî tê riya wan  
Her ev e dawiya wan  
Berhevkar: Jîr Dilovan

# Qijika hawarê li Gündem'ê danî

- Xwendevanên rojnameya Ö. Gündem û Welat we bi tîpa Karga nas kirin. Ev tîp çawa a-fîrî û sedemê ku di demeke kin de li cem xwendevanen bû xwendî cihekî taybetî, ci ye? Li gor we wateya karikaturê ci ye?

Vêga .. divê li vê derê mirov bi du aliyî li vî tişî bifikiye. Yek afirîna tîpa Karga, dido a-

liyê karikaturistî û wateya wê. Bi rastî fikra tîpa Karga ji zû ve di hişê min de bû. Yanî naxwazim bi Cumhuriyetê ji bisînor bikim. Tiştekî bi vî rengî di hişê min de hebû lê ne ev tîp tenê bû. Wê demê xeynî Karga ez li ser du tîpê din dixebeitim: Yek jê bi navê 'Qebile' a din ji 'Mirov yekemîn' (prototîp) bûn. Ez dikarim bîbêjim min wê demê xwe bi zêdahî bi van herdû tîpan ve dişsand, eleqedar dikir. Karga wê demê di kuncikê de bi serê xwe mabû. Min di Cumhuriyetê de bêhtir tîpa Qebile derdixist pêş. Xebata min i prototîp hinekî din marjinal bû û bêhtir diviya ez li ser bixebeitim. Lê li gor şertîn wê demê tiştîn min dixwest ez bînim zimên min karibû bi tîpa Karga pêk baniya. Ü ev xebateke gelek nû bû, diviya bîhata bi kar anîn. Di wê tevlîheviye de min wext dît ku bi Karga ve eleqedar bibim. Karga ji wî awayî derket holê û kemîlî. Vêca hat pêvajoya weşanê, demekê di Cumhuriyetê de di kuncikê bi navê 'Ve insanlar' de hate weşandin. Heftiyê carekê dihat weşandin bes ev têr nedikir, ji ber ku di heftiyekê de tiştîn ku diviyabû Karga ji xwendevanen xwe re bibeje zede dibûn û pê re nedihat gîhiştin. Cihekî hinekî fireh ji jê re diviya, bi vî awayî weşana wê hate sekinandin. Ta rojnameya Ö. Gündemê.

- Yanî Karga ne bi Gundemê cebû beriya wê ji heye.

Erê, erê ... Beriya wê heye. Lê her tim pirsgirêkên wê zedebûne. Di Gundemê de ji serê ewili cihê wê yê ku tê de tê weşandin dibû pirsgirêk lê vê dawiyê ev pirsgirêk neman. Ez dixwazim bîbêjim ku wê demê xwendevan li Karga geleki xwendî derketin, em bi tenê nehiştin.

- We li gor xwe maniya karikaturê ji biniya zimên baş çedîbû ji ber ku der barê danasina wateya tîpa Karga de hin dîtin cihêreg jî hene.

Vêga .. ji bo danasina xebata Karga binavkirina 'xweser' (özgün) heye. Ez vê qebûl dikim. Wekî din aliye wê yê karikatur heye, kolaj û ji hemû malzemeyen dîtbâr (görsel) tê istifade kirin. Yanî ev dice wêneyek be, an grafik be, ji xwe Kaga bi xwe ji grafik ye, yanî her tîstibe. Carina heke bawerî bi netî-

## Portre

**Ertan Aydin**

Di sala 1966 an de li navçeya Safranbolu ku li ser bajare Zoguldakê ye (bajarekî ji bâkûrê Tirkîyê) ji dayika xwe di-be. Bave wî karmendekî dewletê ye. Dibistana xwe ya destpêkê li Muğla, navendlî û universite li İzmirê dixwîne. Li Universiteya Ege ji beşa Wesan û Çapemeniye, Radyo û Televizyonê dixwîne. Di vê navê de bi rojnameya Cumhûriyetê re têklatî datîne û dest bi xêzkirina karikaturan dike. Lê cara yekemîn xebatê wî yê karikaturistî di dema xwendina lîseyê de di rojnameya Yenî Asir de derdikevin. Berî rojnameya Özgür Gundemê bi tîpa Karga (Qijik) demekê di Cumhûriyetê de dixebeit. Ertan Aydin gava tê Stenbolê li vir ji ji Universita Marmarayê ji beşa Hunerên Bedew, Grafikê dixwîne. Ji deme ku Gundem dest bi weşanê kiriye û bi vir ve Ertan Aydin bi tîpa Karga ya xweser (xas) xebatê xwe didomîne. Wekî din ta niha ji ber xebatê wî yen hessas, Dadgeha Dewletê 4 doz li Karga vekiriye.

seyê hehim bi awayê blok nivisan ji bi kar tînim. Yanî di dawiyê de heke tiştekî xweş wê bibe ez di bikaranina malzemeyan de zû bi zû texsîr nakim. Dibe ku di bi navkirina vê xebatê de di serian de tevlîhevi çêbibe û li dû dasîneke mutleq bin. Lê ez naxwazîm Karga bi karikaturî, kolajî an ji bi hîn tiştîn din, an ji tenê bi xebateke grafikî bi sînor bikim. Karga bîsînor e. Divê rehet be. Ji xwe kesaniya Karga ji vê divê.

- Min ev pirs ji ber vê ji kir. Lew re hin kes fîkrîn xwe yên der barê Karga de an ji bi navkirina wê, bi 'rojnameyeke mînatür' tînin zimên. Bi rastî ji carina ji aliye tempoya xwe de bi pêsiya rojnameyeke dikeve. Mirov vî aliye wê ji divê ji bir neke, hûn ci difikirin?

Ev binavkirin xweş e. Gelekî xweş e bi rastî. İltifateke xweş, ez wisa qebûl dikim.

- Di Kurdi de gotineke idiomatik heye mesela ku dema hinek ji devekerê an ji der barê bûyerekê de nûçeyen nexweş tînin ji wan re "Tu weke qijika hawarê yi" tê gotin. We cima ji bo vê xebatê ne navekî cîvikeke din lê yê 'qijikî' bi kar anî. Taybetice wê heye?

Min ev nav ji ber vî awayî da-nî, ew ji di zimanê me de yanî bi Tirkî dema nûçeyeye balkes ji hinekan dibihizin em dipirsin ku ji ku bîhîstiye, dibêjin "Kargalar

söyledî" yanî qijikan ji me re gotiye. Binavkirina Karga ji bi vî awayî kete serê min.

- Wekî din li Tirkîyê bi giştî hûn rewşa hunerê bi û taybetî ji ya karikaturê çawa dinirxîn?

Di vî warî de tiştîn bêngotin gelek in. Bes mirov nikare teví di nav sînorên hevpeyînê de bi cih bike. Vêga ji bo karikaturê ev tîst tev tîn gotin; li kîjan weletî zordestî hebe, kedxwarî hebe li wê derê karikatur xurt dice û ji bo pêşketina her cure warê mîzahî zemîn ava dibe. Dema em iro li weletân ku hunera karikaturê lê bi pêş ketiye dinérin, wek; weletân Amerikaya Latîn, Tirkîye, Yewnanîstan, wek weletân Afrikaya Bakûr, weletân Rojhilat Navîn ev tîst bi awayekî balkes pêşketinekî diyar dîkin. Wekî din li weletân Bloka Rojhilat ji wiha ye. Vê gavê di vî warî de pêşketina weletân B.R. 'ê bi vî tişî ve dihatin gireshî dan "Girîngîya subvanşyonen

dewletê ku dice jêder ..! Em tev wiha difîkirîn. Bi rastî ji di vî warî de teşwîq e k e dewletê ya ecêb hebû. Lê me tiştekî ji bir dikir ku, bi vê teşwîqa dewletê re ji tiştekî ku ev însan bixwazin bêjîn ji hebûn. Yanî mu-xalefeta civakî hebû, yanî ji ber hinek tiştîn ku çewt dimeşîyan reaksyonek hebû.

Ev tîst vê dawiyê hatin ferqîkirin. Em werin ser rewşa Tirkîye. Tirkîye her demê... bes... ya ecêb hebû. Lê me tiştekî ji bir dikir ku, bi vê teşwîqa dewletê re ji tiştekî ku ev însan bixwazin bêjîn ji hebûn. Yanî mu-xalefeta civakî hebû, yanî ji ber hinek tiştîn ku çewt dimeşîyan reaksyonek hebû.

Ev tîst vê dawiyê hatin ferqîkirin. Em werin ser rewşa Tirkîye. Tirkîye her demê... bes...

dema ez dibêjim "Tiriye" dixwazim Anadolû bê fêm kirin. Ji ber ku ez vê peyvê (peyvê Tirkîyê) bi kar nañim... Her demê (çaxê) di Anadolûye de faktörên mîzahî hebûne, di pêvajoya dîrokê de; Xoce Nesreddin (Melayê Meşhûr) hebûye, Bektaşı hebûne... Yanî mutleqa tîpên muxalif çebûne. Yanî ev kes bi awayekî derketi-ne pêş.

D i  
d e m ê n  
d û r e d e ,  
b i g i r s e -  
y i b û n a :  
m e d y a v a h i  
r o j a v a h i  
l i T i

Tirkîye, bi xwezahî faktora mîzahî dertê. Dû re ev mîzah ji aliye mejiyên wê demê ve dîsa bi metodên pîmîtîf dixwazin bêngidosekkirin. Ya nexweş ji, niha tiştîn ku têni jiyandin ji ber wê yekîne: Yanî li Tirkîyê mîzah gîhiştîye merhaleyekê lê zîhnîyeta ku dibêje divê mîzah di bin kontrolê de be, hê ji zîhnîyeta Osmanî ye. Divê rexnegirîn li Tirkîye ji Osmanîtiyê bubuhurîn. Ü divê şikandina şablon û normen di serê kesen li hember xwe de bidin ber cavê xwe. Ji nav wan sînoran derbîkevin ku dengê muxalifan ji rehettir bê bîhîstîn. Lê ku xwe ji vê dûr bigirin û eynî şablon û eynî peyvû gotin bêngi bîkarân wî wextî balyoz li serê muxalifan tê xistin. Di vir de tişta girîng û bin-gehin ew e ku mirov zore bide şablonan. Lew re mejjî eynî ye. Mejiyê Osmanîtiyê ye...

Ji bo roja iro her çigas kîmasiyen wan hebin ji ko-

varêñ mîzahî ji wan salen pêşin ta niha di vê pêvajoyê de ji mîzahî û pêşketina wê re zemînekê avakirine. Lî iro li Tirkîyê faktora mîzahî li hember muxalefeta civakî tê bi kar anîn. Tê dejene-rekirin.

D i

h e m û

d e m ê n

d i r o k ê

d e h u -

m e r -

m e n d

d i b û y e r -

c i v a k i

d e

her yek mîsyonekê hilgirtine ser xwe. Lî di dawiyê de pêvajoya vî tişî tê; hêzîn serdest huner-mandan bidest dixin û bi alî refîn xwe ve dikişîn. Ü iro mejiyên huner-mandan i afînîn di bin emrê teknolojiyê de ye.

Bes divê huner-mend li pêşberî civakî be lê hêza xwe ji civakî bistîne. Yanî cihê ku gi-hîşte divê civakî ji bikişîne wir. Gava ji civakî veqete, li gor min tu mîsyona wî nemaye. Edi bû-yê mexlûqatê.

- Em disa werin ser Karga û Gundemê. Hün ji xeynî Karga vînyet ji xêz dikin. Çima hün karikaturê naşixulin. An hünê di pêşerojê de bişixulin?

Dixwazim di vê dema pêsiya me de, bi awayê karikaturê mîzahî yê rojane bixebeitim. Ü vê xebatê di Gundem'ê de pêk bînîm.

- Karga wê here li dereke din deyne an na?

Na... Na... Wê Karga li ser vî guliyî be naçe ser yekî din!

- Tiştekî din ku di Karga de bala min dikişîne ev e; der barê binavkirina termen cografik de ye. Hün Kurdistan di kuncikê Karga de bi "rojhilatê başûrê Tirkîyê" nav dikin. Bi kurtasi hün karin der heqê vê de hin tiştibîbîn.

- Baş e ku we ev pirs ji min kir. Gelek kes meraq dikirin. Ez dixwazim vê diyar bikim. Ez nabêjim 'rojhilatê başûrê Tirkîyê' ez dibêjim yê Anadoluyê ji bo yê ku li vî alî ji dijîn (rojava) ez dibêjim "İnsanîn ku li rojavayê Anadolê dijîn." Ez li hember fikra ji hev veqetina Kurd û Tirkim. Di dawiyê de ji bo min in-san in-san e. Erê iro pirsgirêka

Kurd heye. Ü ev pirsgirêk ya dinyayê hêmüyî ye. Tenê neya vê cografayayê ye. Çawa pirsgirêkên wek yê İrlanda, Somali, Elsal-vador û hwd. yê hemû dinyayê bin, pirsgirêka Kurd ji wisa ye. Ji ber vê yekê ez dibêjim divê mi-r o v w e x t ê xwe bi

binavkiranan re winda neke.

**Hepveyen: Rûken Baxdû**

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyare Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.

**Welat**